# DESTÊ ZÊRÎN

## ÇÎROKÊN GELERÎ

Hamid Dêrik

(Necim Abdulah)

Weşanên Parastina Gel (HPG)

Çapxane: Çapxaneya Roj

Dîroka çapkirinê: Adar 2010

# DIYARÎ

**Ji vîna giyanê xwe bi ronahiya azadiyê re kirîn dengvedana vejîna gelan**

**Ji hemû bav û deyîkên qehremanê bizava rizgariya gelan re**

**Ji xort û keçên agir û rojê re**

hişedaran hercarekî kur û bavê xwe hevdû diguhertin heyanî ku rojê bi tîrêjin xwe edr û ezman dorpêçdikir û barîna berfê hêdî hêdî radiwestiya. Lê dema ku dinya hêdî hêdî vedibû mirovê rehsipiyê gund çavê xwe li derdorê xwe gerand û dema xwest li rewşa xaniyên gund meyzêne, ji bilî mala xwe zaxlem û li ser biyan nedît, hemû xanî û derbanên gundiyan di bin berfê de xwaro maro bûbûn û hemû darên ser dîwarê xanî û eywanan hêdî hew giranbûna berfê radigirtin û xwe radestî qedera xwe dikirin. Ji ber vê yekê gundiyan hêdî nema xwe li gund digirtin û hemûyan piştî wê zivistana zor û dijwar malê xwe ji gund barkirin û berê xwe dana bajarê Şeldizê û ji wê rojê û şûn de navê çiyayê ku gund li pesara wî bi cî dibû bi nanê çiyayê Zengil hate binav kirin û tişta herî balkêş ji xweşikbûnên vî çiyayî ewe ku li navsera vî çiyayî tehteke mezin heye û di hindirê tehtêde kunek vebûye û dema ku roj nûke derdikeve ji mirovê ku li rûbirûyê vê tehtê sekinî re roj xwiyadike weke ku guleke sor ji nîva wê kunê bibişkive û şewqa xwe dide her deverî. Erê ez bawerim me biriya gotin û peyvên xwe, karî ku em ji were henek rastiyên heyî bilêv bikin berî ku bêdengiya şevê û pêlên tariya zilomat me bi hêz û taqeta xwe re berû dinyaya bê tixûb ve dûr û kûr birevîne weke derbasbûna dem û çaxan.



**NAVEROK**

DESTÊ ZÊRÎN……………………………….…..8

BERIKÇÊKER………………………………..17

ESLÊ JINÊ JINE NEJMALÊ MEZINE……….…21

GIYA NAMÎNE DİBİN KEVIRANDE……..…..24

ŞÊR ŞÊRE ÇI JINE ÇI MÊRE……………..……31

AQİL TACA ZÊRÎNE……………………….….36

AQILÊ SIVIK BARÊ GIRANE……………..….45

KURÊ ŞÎR HERAM…………………..……..…53

Qoqo……………………………………...…….57

ZEYNIKA ZÊRA………………………….……77

ÇIYAYÊ ZENGIL…………………...………86

## PEŞGOTİN

Di civaka her netewekî de gelek rastiyên vê jiyanê hene û weke evsaneyan û serpêhatiyan di hişê mirovan de cihê xwe digrin û roj bi roj rastiya van serpêhatî û çîrokan ji mere ronî dibe.

Ji ber ku ez dikarim bibêjim ez bi van destanan û çîrokanre xwidêdame û mezinbûme û hîn di bîra min de dengvedana dengê pîrka min tê guhê min û hîn ew çîrohên ku ji mere digotin yek bi yek di hiş û remanê min de cihekî xwe yê cuda heye.

Ji ber ku dîroka bav û kalê me Kurdan bi zimanekî wêjeyî hatiye vehûnandin, ji awaz û serpêhatiyên bi devikî bigre heyanî destanên qehremantî yê ku tê de bi rengekî baş jiyana gelê kurd tînin ser ziman, nimûne ji van çîrok û destanan; destana Mem û Zîn, Siyabind û Xecê û Derwêşê Evdî û Edûlê û herweha… gelek çîrok û destanên ku ji mere rastiya jiyanê ravedikin û weke dîmenekî zindî wata jiyanê ji her milê wêve ji mere radixîne ber çavan.

Ji ber ku baş tê bîra min dema hîn temenê min biçûk bû pîrka min em li derdorê xwe dicivandin û komdikirin û her şev ji mere çîrokek tanî ser ziman û dema ku pîrka min wê demê ew çîrok ji mere digotin û bi şêweyekî xweş û delal dihûnandin û ji mere weke filman roj bi roj tanî ser ziman, bi rastî em bi wan çîrokanre kûr û dûr diçûn û weke zincîre filmekî em bi xweve didane girêdan û her roj em ji berî demê kombûnê dihatin û li derdorî pîrka xwe komdibûn û me bi dilekî germ û bi çavên matmayî û bi baldarî li wan çîrokan guhdarî



weke dî jî hemû xelik û milet dest bikelandina danûkan dikin û pey re dihêrin û têxine savar û danînok û meyîr û herw…
Ji her milî ve gundî hazirî û amedekariyên xwe dikin ji ber ku her zayînde û ajalên dinava vê xwezayê de heyî û dijîn ji her milîve hazirî û tevdîrên xwe dikin û xwe têxine hindirê hêlîn û ciyê xwe de heyanî ku çilê zivistanî di ser wan re derbasbibe. Ji ber vê yekê weke me diserî de ji were dayî nîşandan navê çiyayê Zengil ji navî gundê Zengil tê. Ev gundê ku dikeve pesara çiyayê ku pey re binavê wî gundî tê binavkirin û cihê gund dikeve raserî bajarê Şeledizê yê ku dikeve ser ava Zapê û pêşberî çiyayê Kurejaro ji milê bakur ve û ji rojhilat ve berê gund dikeve devera berzan û çiyayê Şêrîn. Gundê Zengil xwedî cihekî giring û dîrokiye, ji ber wê yekê gorî ku rehsipiyên vî gundî dibêjin ku rojek ji rojên zivistanê yê bi sir û seqem, berf bi qeflatan dibariya ser rûçikê axê û her dever dinava sipîpûna xwe de noqdikir û dorpêç dikir, li ber çavê te xweza weke bûkeke ku xwe xemilandiye lê dihat û ji ber barîna berfa xurt û şideh erd û ezman wek hev lêdihat. Barîna berfê her lêdikir û bê ku bênvedanekî bide barîna xwe, te digot qey ewrên berfê qubale girtine û dixwazin bi xezeba xwe hemû zayîndeyan hişyar bike û sehwa xwe berde nav dilê wan. Hemû xelqê gund diketin nava liv û tevgerê de ji bo ku çareyekî ji vê belaya ku dibare ser serê wa û gundê wan û her yekî bi awayekî tevdîrên xwe digirtin lê di dawiya dawiyê de bi ser neketin, çiqas ku berf ji ser banê xwe tavêtin jî lê piştî demekî kurt dîse careke din berf li ser komdibû û te digot qey te berf ji ser ban ne avêtiye. Ji hemû xelkên xwediyê gund zilamekî reh sipî û bi emir, çareseriyek ji xwe re dît ku biriya wê mala xwe û kufletê xwe ji mirinê rizgarbike. Mirovê aqilmend rabû zengilek li ser banê xaniyê xwe bi darekî ve xweşik girêda û asêkir û li ser dengê zengil dizanîbû ku berf çiqas li ser banê xaniyê wî kombûye û çiqa ku dengê zengil qutdibû dida ser xwe û bibayê bezê wî û kurê xwe hemû berfa ser banê wan kombûyî tavêtin û bivî rengî û li pey hev karê xwe bivî ewayî didomandin û weke

ÇIYAYÊ ZENGIL

Bi tîjikên roja renge reng re, yê ku weke ava çemê Zapê diherike ser çol û zozanên Metîna, Gara û nevsera çiyayê Kurejaro. Her tiştî xwe ji nûve bi rengê keskesorê dixemiland û cihê xwe di ferhenga xwezaya bi xêr û bêr de digirt bi şehnazî û xweşikbûna xwe dibû navenda her dîtineke ku mirov ji şemala wê sermest dibe.

Erê çiyayê Zengil, dema ku mirov ji navsera perên te xwe dighîna erşê ezmanê bê binî û serî, wê demê xwe weke bazekî azad hîsdike û naxwaze ji wan bilindahiyan xwe berde deşt û newalên kûr û dûr. Gorî min bihîstî navê te bi çîrokeke kevnar ji nava rûpelên dîrokê dikişe weke avzêma diherike gerdena axa pîroz.

Ji ber vê yekê ez dixazin tevnê çîroka te hêdî hêdî li teşiya dilê xwe babidim û jê gelek dîmen û wêneyên bi reng û deng bi afirînim.

Rojek ji rojên zivistana qir û seqem, li her deverî ba û bablîsokê kirasê xwezayê jê dişehitand û pelçemên daran bi xwe re direvandin berû dol, çiya, dehil û deviyên asêve werdikir. Hêdî hêdî û hûr hûr berfê lêdikir û dixwest ku bi cil û bergên xwe yê sipî pîr û pak erd û ezman bixemilîne, ji ber ku weke em dizanin zivistan bi berf û seqema xwe ji hemû demsalan cudati re, lewma hemû xelik û alem berî ku bikevin demsala zivistanê ji her milîve amedekariyê xwe dikin. Di serî de darê hişk û ziwa komdikin ji bo ku xwe pê germbikin û pê nan manê xwe û xwarina xwe bipêjin û qûtê xwe ji dexil bigre heyanî bacan reşk û bacanê sor li ber tava peyîzî ya dijwar hişk dikin û têxina nava telîsan de ji bo ku di rojên zivistanê yê sar û cemidî de bikelênin û bixuin û



dikir. Carnan wan çîrokan em bi xwere dikenandin û carnanwan çîrokan em bi xwere digiriyandin û carnan em ditirsandin û te her tiştê xweş û şad di rastiya wan çîrokan re didîtin. Bi vî awayî, tê bîriya min me li wan destan û çîrokan guhdarî dikir heyanî ku em bi xewre diçûn û em diketin di nava xeyalên kûr û dûr de.

Bi vî awayî mirov bi rengekî baş resentiya wêjeya kurdî ya kelasîk û ya nûjen di nava van destan û çîrokan de didît, ji ber ku dîroka rastî ew dîroka nehatî nivîsandine û weke em dizanin ku dîroka gelê kurd ji milê hêz û pergalê n serdest ve hatiye nivîsandin û gelek ji vê dîroka resen û ya giran buha hatiye dizîn û hatiye şewitandin û wendakirin, lê tenê ya meyî ji vê dîroka wêjeya gelê kurd, ew dîroka di warê devikî de û ji nivşekî xwe gihandiye nivşê din û herweha gihiştiya roja me ya îro.

Ji ber wê yekê dema em li van çîrok û destanan guhdar dikin yan jî dixwînin pêwîste em ji van destan, çîrok û serpêhatiyan rastiya civaka kurd ya nepenî derxînin holê û em nebêjin ku dîroka me kurdan dîrokekî xizana di warê wêjeyê de, ango pêwîste em xwe bi dîroka xwe bidin naskirin û weke rêber APO jî dibêje “em di destpêka dîrokê de veşartîne û dîrok di roja me ya îeode veşarti ye”. Lewra her tişt xwe ji nûve di bedena van çiyan de û di nava rûpelê vê xaka pîroz de xwe bi deng, reng û vîneke azad dike û weke zarokekî ji nûve çavê xwe li jiyanê diveke û ji nûve fêrî rastiyên jiyanê dibe.

Li gorî vê yekê dema ku li kîjan milî ve li dîroka wêjeya kurdan dimeyzêne, wê gavê tu dibîne ku ev wêje ji her milê xwe ve mirovan têrdike û wata jiyanê ji nûve bi her milê wê ve dihûnîne û dixemilîne.

Hamid Dêrik

DESTÊ ZÊRÎN

Li welatekî dûr, rojekî yek hebû û hej ji keçmama xwe dikir û çiqa xwezgînî verêdikirin ji bo ku ji xwere biguhezêne lê kir û nekir malbata keçikê ji ber ku nayartî û xwînîtî di navbera wande hebû nepejirandin ku keçikê bidin wî. Ji ber wê yekê biryara xwe da ku keçmama xwe ji xwe re birevîne. Hemû bav û diya wî û hemû xiz û mirovên wî jî terfdarê wî bûn ku hêdî neçê destê keçmama xwe nexwaze ji bo ku tu alûzî û pevçûn dinavbera wan de dernekevin û tu mêr newne kuştin;lewma ji wî xwestn ku ya baş ewe ku birevîne û weke ku kuçer dibêjin “yê ku pevjîna xwe nerevîne ew ne zilame.” Xwrtê ciwan kar û barê xwe kir û wî û kwçmama xwe biryar dan ku bihevre birevin. Wê demê kurmamê wî jî biryara xwe da ku ewjî alîkariya wî bike û di bin tariya şevêde wî û hwskiriya xwe destê hev girtin û berê xwe dane felekê û pişta xwe dane oxirê.
Bi berê sibehêre gihiştin çole û çolistanekî ne bêjna ensan an jê cinan jê tê û konê xwe li wê rastê vegirtin.
Dinya ziviztana, sir û seqema dijwar bi mij û morana xwe mirov ji tariyê û bablîsokê qasî gavekî pêşiya xwe nabînê, dem dem nêçîrêye ji ber ku ajal û lawir ji ber berf û sermayê ji liv û lebatê dikevin û şopa wan xweş li ser rûyê berfê xwiyadike lewma wê rojê başe û keşe derketibûn nêçîrê û dirêde keşe dema ku li ser dewsa kîvroşkekî diçû haj ji xwe nemabû hew xwe dît ku wê ji hevalê xwe dûrketiye û ji ber mij û morana tarî hêdî nizanîbû bikîjan rexîve bimeşe, wê demê ji nişkîve liqayî konê ciwanê ku keçmama xwe revandî tê.



kete ser rûyê erdê, gundî hemû ji hundiran derketin û bi kevir,qosk û berkanîkan berê xwe dane hirçê û ew ji derdorê gund dûrkirin.
Zeyno, ji ber ku asta xezeba hiçê dizanîbû lewma ji xelkê gund re got: Ew bi rehetî bela xwe ji me venake û wê careke din êrîşî me bike, ji bona vê yekê gelek em çareyekî ji vê pirsgirêkê re bibînin, nexwe wê hirçê gundê me xirabike û tu tama jiyanê ji me re nahêle.
Ji ber vê yekê pêwîste em vê carê bi tevdîr û hazirî bin beramberî êrîşên higçê û em bikaribin bihev re dawiya wî bînin.
Lewma hemû xelkê gund ketin nava livûtevgerê de, ji bo ku debarekî ji vê belayê re bibînin.Vê carê hemû xelqê gund bihev re şêwirîn ka çibikin û çinekin, ji ber ku çarenîne an divê careke din Zeyno lê bizivirênin û ewjî negengaze,ya dinjî ewe ku xwe radestî qedera ku diserê wan de hatiye û li ber rehma hirçê roj bi roj fatîheyê li ser rihê xwe bixwînin.
Wê gavê ji rehsibîyên gund zelamekî kal ji wan re nexşeyek danî û ji wanre got:
Gava yekê ewe ku em bikaribin hirçê bikşînin ser
bixêliya serê banê malê û em jê re bibêjin were ser bixêliyê ji bo ku em têre Zeyno bidine dest te.Wê gavê dema ku hirç were ser bixêliyê emê sîxekî dirêj dinava agirde sorbikin, di ûrê wîre bikin xwar û ji xezeb û bela wî xilasbibin.
Gundiyan tişta ku rehsipiyê gund ji wan re vegotî yek bi yek ew hemû bicihanîn. Bi vî awayî û bikeda hemû xelkê gund hêdî hêdî hirç qayîl kirin ku were li ser bixêliyê. Wê dema ku hirç gihişte ser bixêliyê, sîxê dinava agir de sorbûbû û ji nişkî va du-sê gundiyan bihev re ew di ûrê hirçê re kirin xwar. Hirçê dîn û har dicihde orên pê ket û bişûnve ji ser banê xanî kete erdê.Biştî demekî hirç xwe tevdida,vîmilî de wî milî de lê feyde nake,taqeta wî nemabû û hêdî hêdî xwîn ji birîna wî weke avê diherikî û wî jî xatir ji jiyanê dixwest.
Hemû xelkê gund bi kuştina hirçê kêvxweşbûn û dîse dest bişahiya xwe kirin û girtin govend û dîlan.

Ji ber hatina Zeyno û vegera wê ya bê qeza û bela, bavê wê ferman da ku sê roj û sê şevan li gundê wan bibe kêf û şahî.
Lê Zeyno ji bavê xwe re kifişkir ku hirç bi rehetî ji dev wan berna de û wê gundê wan di ser sere wande xera bike. Lewma pêwîste ku em xwe ji bo vê yekê hazir û amede bikin. ji ber ku dema hirç vegere cihê xwe, min nibîne û herdû zarokên xwe yê ji nêza digrîn û dibehicin
Wê gavê hirçê hirçê dîn û harbibe û wê heyfa xwe ji me û gundê me hilîne.

Çiqas xelkê gund tirseke wane ji hatina hirç ji milekî ve hebû, lê ji milekî din ve jî xwestin kêf û şahiyê bikin ji bo vê mizgîniya ezîz û şêrîn li ser dilê wan.
Em vegerin ser hirçê. dema ku hirç ber biêvarî ve divegere û ji hindirê şikeftê dngvedane zûrezûra zarokên xwe dibhîze û tu bêjna Zeyno li hundirê şikeftê nake, wê gavê dîn û hardibe û bi hûrehûr berê xwe dide gundê bavêZeyno.
Kelkê gund di nava kêf û şahiyêde xwe winda kiribûn û hayê wan ji hatina hirç nebû, lê dema ku dengê hûre hûra hirçê ji raserî gund dihat wê demê hemû kelkê gund û bibayê bezê berê xwe dane xanî û malên xwe ji ber xezeba hirçê dîn û harbûyî.
Hirçê çav sor û har ber diser gund de dixindirandin û gazî dikir Zeyno,Zeyno, vegere mala xwe vegere zarokên te ji nêza dimrin vegere Zeyno.

dikir Zeyno,Zeyno were mala xwe.Were,were
Zarokên te ji nêza digrîn û dimrin.

Dema ku dengê hirç gihişte guhê gundiyan hemûkan ji tirsa û xofan xwe kirin hindirê xaniyan û derî li xwe dadan û mane li bendê ka hirçê çibike û çi nake. Hirç li derdorê malê gundiyan dikire hûre hûr û kevir li ser malê gundiyan de toldikirin.

Ji merxebê heya nîvê şevê hirç bela xwe ji gundiyan nevekir;ji ber vê yekê gundî bi tevî sewal û mewalên xwe dihindirê malên xwe de mabûne asê û ji ber hirç nedikarîn ji hundiran derbikevin. Gundiyan êdî ji rewşa xwe û sewalê xwe tehemul nedikirin. Ji ber vê yekê dema ku êvar hat û tarî



Keşe destûra derbasbûnê dixaze û ji kesên ku di hindirê konde re dibêje hûn mêvana dihewînin, ji nişkava yê ciwan û desgirtiya xwe divejniqin lê ciwan dedikeve derê çadirê û dibêje keremke mêvan mêvanê xwedêne ser sera û serçavan mêvanê hêja û delal.
Wê şevê keşe li wa dibe mêvan lê rastiya xwe ya keşetiyê ji wanre kifişnake.
Çiqas ku yê ciwan û desgirtiya xwe ne xwedî derfet û amûrin lê ye bizneke wan heye û jê car caran şîr didotin ji bo xwe, lê ji ber merdbûn û deyer dayîna mêvanan, radibin ji mêvanê xwe re bizina xwe serjêdikin û dikevin nava amedekariyê şîva mêvanê xwe.
Keşe li serê çadirê rûniştiye û ji berî ku sohbet destpêbike, keşa xwest ku çiqareya xwe vêxênê, rabû çeqmeqê xwe ji kûka xwe derxist lê ciwanê malxweyê malê henek tirafa germ li ser destê xwe jêre anî ji bo ku çiqareya xwe jê vêxê;lê dema ku keşa ev yek dît matmayî ma, lê xwest ku têbighîje ka tehemûla wî heyanî çi astiye, ji ber vê yekê li ser hemdê xwe çiqara xwe pêça û bere li bin çavê xwere li rûyê yê ciwan dimeyzand demek derbasbû û destê yê ciwan dest bişewatê dikir lê xweliya gerim ji destê xwe nerijande erdê heyanî ku dilê keşe pê şewitî û çixareya xwe jê vêxist, ji nûve ciwanê gewr tirafa gerim ji destê xwe rijande erdê.
Ji ber vê kiryarê yê ciwan cihekî mezin di dilê keşede digre û ji wan pir kêfxweş û memnûn dibe, lê rastiya xwe ji wanre nabêje û xatir ji wan dixwaze û birêdikeve.
Dema ku keşe divegere cih û meqamê xwe hîn ew zilamê ciwan û mevandariya wî, qedir û qîmeta ku jêre deayî nîşandan di bîra wîde deçe û tê.
Ji ber vê yekê bi bayê bezê dema ku dighîje qesir û qonaxê xwe, gazî nîgeban û hişedarên xwe dike û ferman dide wan ku gazî wî zilamî bikin û wî bînin.
Dema ku zilamê ciwan dighêje hizûra keşe û piştî demekî kin dema ku keşe çavê xwe lê diçîrîne, jêre dibêjê ma te ez naskirim? An na: Zilamê ciwan jêre dibêje erê min tu naskirî.

Keşe careke din lê dizivirîne û jêre dibêje, ma te zanîbû ez kîme? Zilamê ciwan: Na min tu nasnedikirî.
Wê demê keşe dest bi xeberdanê kir û jêre got: Te di demeke pir teng û girande ez ji mirinê xelaskirim û qencîke nayê jibîrkirin bi min kir, ji bo vê yekê ez jî dixwazim beramberî qenciya te qencîkî bite bikim, ji ber wê yekê tu çi bixwazî ez li ber te hezir û amedeme, tenê tu daxwaziya di dilê xwede ji min re bêje. Lê zilamê ciwan dibêjê tiştekî naxwazim saxiya te û temenekî dirêj ji tere dixwazim. Lê keşe napejirîne û dibêje eileh û tileh nabe pêwîste ku tu daxwazîkî ji min bixwazî û ez nahêlim ku lingê te ji mala min derkeve heyanî ku ez bersiva wê qencî û mehrîfeta ku te bimin kirî.
Li ser daxwaziya keşe zilamê ciwan, xwesteka xwe ji wî re beyankir û ji wî dixwazkir ku biwanre bijî û şolekî li cem wa bikê. Dema ku keşe jê dipirse tu dikarî çi karî bikî? Zilamê ciwan ez dikarim hespa fêrbikim, lê daxwaza min ewe ku kurmamê minjî bimire be.
Keşe merema zilamê ciwan dipejirînê û jêre malekî avadikê
Rojek ji rojan dema ku zilamê ciwan hespê keşe dibê çol û beriyê, ew û zilamekî din bihevrene. Ji nişkîve celebek ji talanciyên riya dibrin û mirovan dikujin êrîşî wan dikin, wê demê zilamê din direvê tenê zilamê ciwan weke fêrisekî û mêrxasekî dikeve pey wan çil siwaran, gelekan ji wan dikuje û yê mayî birev reva xwedê xwe bi peyatî xilasdikin.
Dema ku Reşo ber bi êvarîve bihespê celebê hespê keşeve tê malê, ji keşere nabêje hal û meseleya ku pêre li çolê qewimî; lê mêrikê ku pêrebû û mêranya Reşo bi çavê sere xwe dît, ji keşere tişta dîtî hemû anî zimên. Wê demê keşe ji mêrbûn û mêrxasiya wî şaşomaşo dibe û gazî Reşo dike.
Keşe ji Reşo dipirsê û dibêjê roja te îro çawe derbasbû, tu qeza û bela biserê te de nehatin Reşo, rojeke pir xweşbû û ez pênehesiyam çawe derbasbû. Keşe dibêjin ku diza û talanciyn ser riya êrîşî te kirine û xwestine hespê te birevînin, Reşo, nexêr tiştekî wise nebûye.
Reşo nexwest tişta ku pêre qewimî ji keşere bibêje lê dema ku keşe li pey hev jê pirskir û xwest ku tişta ku pêre qewimî



Ev keça moxtarê kundê me Zeynoye ya ku keskî nizanîbû ka çijêhatiye û bi kûve windabûye.
Li ser vê yekê pevjîna şivên hema rabû ser xwe, av danî ser agir û destek cilên xwe anîn û dest bi şiştina serê Zeynokir te digot qey gemara vêqa dinyayê dinava pora serê Zeyno de kombûye bi heft sabûnê helebê û du biroş ava kelandî bizor laşê Zeyno ji bihinê û gemarê paqijbû.
Şevanê mala moxtar xwe negirt heyanî ku pevjîna wî serê zeyno biqedîne û nûke xeberê bighîne moxtar.
Ji ber vê yekî û ji berî ku tu kes pê bihse û mizgîniyê bighîne wî, hema bi yekcar xwe weke bablîsokê gihande mala moxtar û mizgîniya dîtina Zeyno ji wanre vegot.
Dema ku moxtar û pevjîna xwe ev salox ji devê şivên bihîstin ji keyfa lingê wan erd nedigirt, heme bi lez û bez berê xwe dane mala şivên.
Wê demê pevjîna şivên serê Zeyno şûştibû û henk cilên xweşik lêkiribûn, pora wê taze şekiribû û kiribûne keziyên dirêj weke maran.
Dema ku dayîk û bavê Zeyno dane deriyê mala şivan û derbasî hundirê odê bûn,ji nşkîve çavê wan bi keça wan Zeyno ket, heme xwe avêtin hembêza hev û herdûkan bihevre dest bi barîna rondikan kirin.
Heme piştî ku dê û bavê Zeyno gihiştin mala şivên û keça xwe Zeyno bi xwe re anîne malê hemû xelkê gund pê hisiya ku Ziyno bê qeza û bela vegeriyaye malê.
Lewma ji ber vê yekê mala moxtar ji hatin û çûna mêvanan valenedibû.
Civata moxtar digeriya û ji kêf û xendeyan fincanê qehwê, çayê û şerbetê dinava destan de diçûn û dihatin.
Hemû xelkê gund xwestin ji devê Zeyno çîroka wê bibhîzin,ji ber wê yekê û li ser xwesteka gundiyan, Zeyno ji gundiyên xwe re dest bi vegotina çîroka xwe ya bi êş û jan kir.
Hemû xelkê gund li çîroka Zeyno û hirçê bi baldarî gohdarî dikirin û ji jiyana wê ya bi êş û azar ya ku bi hirçê re derbaskirî gelekî jê matmayî û sosret diman.

meşa xwede diterpilî û devdevkî diçû erdê. Dem biharbû û xweza dinava keskayiyêde dixemilî, dengê çivîk û bilbilan ji her devrî weke çemê avê diherikî û şivanan li çol û qelaçan pezê xwe diçêrandin.

Piştî demekî Zeyno xwe gihande seranserî deştê. Ji nişkî ve dema ku çavên wê bi keriyên pez ketin ji keyfa dikir ku bifiriya û ji keyfa hingê wê erd nedigirtin. Tişta ku bi çavên xwe didît aqilê wê bawer nedikir raste an, na.

Zeyno nikarîbû weka berê bipeyîve ji ber ku zaravayê xwe ji bîrkiribû û tenê kaze kaz û qîr ji devê wê derdiketin û berû şivanê pez ve dibeziya.

Şivan li ser reyîna seyê xwe bêjna mirovekî dikir lê çiqas çavên xwe gerand û negerand lê tiştek li ber çavê wî nediket. Piştî bêhnekî

dît ku vaye tşteke berû wî ve tê, lê nedizanî ka cinse, inse, ajale an jê mirove. Lê piştî ku hîn bêtir nêzîkî wî dibû tê gihişt ku jineke. Lê ji ber ku pora wê weke ya dehbeyan lê hatibû û tijî nav de qirşikmirşik bûbûn û sîmeyên rûyê wê ji gemar û tozê tevlîhev bûbûn lewma yê şivan didespêkê de nasnekir; lê piştî ku bi awirên xwe hemû rexên wê di ber çavên xwe birin û anîn ji nû ve têgihişt ku ev jina han Zeynoya keça moxtarê gundê wane ya ku keskî nizanîbû ka çi jê hatiye, lewma ji kêf û şadbûnê nizanîbû çibike û çineke. Ji ber vê yekê heme rabû desmala li serê xwe pêçayî dirêjî Zeyno kir ji bo ku laşê xwe yê nîv tazî pê bibêçe, pezê xwe dabêşiya xwe û destê xwe kirin bin çengê Zeynode û berê xwe yekser dane gund.

ji ber ku moxtar aoz û ehid dabû ku kî mizgîniya dîtin an bihîstinekî ji keça wî bighîne wî ewê tişta ku ew dixwaze jê re pêkbîne.

Lewma yê şivan xwest ku berî kes pêbihise ku keça moxtar hetiye û mizgîniyê bidine wî ew pêşiya herkesî vê mizgîniyê bide moxtar, lê ji ber ku nedixwest ku dê û bavê Zeyno wê bi vî halî bibînin lewma diserî de ewbire mala xwe û ji pevjîna xwe re got:



belîbike. Wê demê Reşo mecbûr ma ku ji keşere ta biderzîve bikê.

Piştî ku Reşo tişta ku pêre qewimî ji keşere vegot, keşe xwest ji ber mêrantî û lehengiya Reşo diyarîkî radestî wî bike an jî xestekeke ku ew dixwazî jêre bicihbîne.

Lê heçî Reşoye tenê daxwaziya xwe ji keşe ewe ku bimê cem wî û karê xwe berdewambikê; lewma tu daxwazî ji keşe nekirin.

Lê keşe vê carê biya xwe kir û gazî zêrînker kir û ji Reşor e got ez bûme sedemê şewitandina destê te û êşa canê te, ji ber wê yekê destekî zêr ji Reşore çêkir û ji wê rojê û pêve navê wî bû destê zêrîn û herkesî gazî wî dikir binavê destê zêrîn.

Ji ber mêrantî û mêrxasiya destê zêrîn keşa ew kire serleşkerê artişê û berpirsyariya paristina qesir û qunaxê xwe radestî destê zêrîn kir.

Ji ber ku keşe xwedî gelek mal û milkbû lewma tim rastî êrîşin kesê dilreş û çavnebaran dihat û ji wan kesê neyartiya keşe û dijminatiya wî dikirin hakimekî din li wî bajarî hebû û tim dixwest ku her tiştê heyî têxe bin bandor û destên xwe, lewma her tim dinavbera wî û keşede gengeşr û pevçûn car car bê navber derdiketin.

Carek ji caran dema ku artêşa hakimê dijberê keşe dinava liv û lebatêde û dexwest ku keys û firsendekî bibîne û derbekî li keşe bêxe. Lê Destê zêrîn nexşeya wan û niyeta wan zû ferqdike ji ber wê yekê nexşeyekê datîne û bifêlbazî û aqilmendiya xwe dike ku hemû goleyên artêşa hakim li wan bizivirin û artêşa wî hemû difeşkilin, binbikevin û hemû jî serşor û kezebqetandî rev reva xwedê xwe bighînin baregihê xwe.

Roj bi rojê ji ber şarezarbûn û serwextiya Destê zêrîn û mêrantiya wî ya bê hisab û sînor, Destê zêrîn diçavê keşe de mezin dibe û heskirin û kêfa keşe tuqat jêre tê.

Li gurî ku dibêjin, Destê zêrîn bieslê xwe kurmance û gurî ku tê zanîn kurmanc mêr û xwedî eslin û tucaran xiyanetê nakin serî didin lê welat nadin.

Dîse keşe dixwazê ku Destê zêrî xelat bike ji ber ku serê wan dinava gel de bilindkiriye û nehiştiye ku kêf û çavnebariya dijminan bi wan were û namûs û şerefa wan parastiye.
Lê di despêkêde weke hercar Destê zêrîn tu daxwaziyên xwe ne anîne ziman, lê dema ku keşe dubare û li pey hev xwest ku Destê zêrîn meremek di dilê xwede ji wî re bîne ziman. Ji ber vê yekê Destê zêrîn ji keşe biqasî kevelê ka min erd ji te divê.
Ji ber gotina Destê zêrîn hemû kesên li civata keşe pê kenîn û gotin : Mal xirabo heme te tiştekî mezintir bixwesta, bi qasî kevelê ga têra nimêja tenake, tê çi ji hewqa erd bikê, Destê zêrîn ezê dixwazim dinav de xaniyekî ji xwere avakim. Li ser daxwaze Destê zêrîn hakimê keşe ferman da ku li gorî dilê wî û tişta ku dixwazin bikin.
Keşe pisporekî ji meselê bîvanê erdan têdigehê û berpirsyarê xizîne û malê xwe bi Destê zêrîn re verêkirin û ji wanre got çiqa diraf an jî zêr pêwîstbin bê qisûr û hisab bidin ji bo daxwaziya wî bicih were malê dinê hemû gorî wî bê.
Diwê navêde gak gurandin û bibayê bezê kevelkirin û kirin nava avêde û têde hiştin heyanî nima şoxlê rojekî û bi şefaqêre derxistin, dîtin waye ji hev vekişiyaye rabû ser xwe ew kevelê ga hemû kire terîş û hemû li pey hev danî û jêre gotin cihê ku dilê te bixwaze tu dikarê ji xwere bibjêrê. Bi kevelê ga yê ku Destê zêrîn kirî terîş terîş bi qayî erdê keşe jêre derket.
Ji ber vê yekê yê li ser xezîna hekim û yê li ser erdê hekim herdû ji karê Destê zêrîn û şarazariya wî matmayî man û didilê ji hevre gotin evî zelamî erdê meyê xweş hemû ji xwere veqetand û bir. Dema ku salox gihişte hakim û Destê zêrîn bi kevelê gamêş qasî erdê wî ji xwere girt. Hakim di cihde derket derve û li rewşê bi baldarî temaşe kir, hîn bêtir kêfa wî ji Destê zêrîn re hat û baweriya wî pê xwirtirbû û mezintir bû.
Keşe qet xemgîn û ture nebû ji ber girtina Destê zêrîn ji erdêre, lê belê diser ewqa erde jî jêre got: te çiqa mirov divin



Hirç derbasî hundirê şikeftê bû û li pişta wî kîsekî tijî xirad hebû.
Hêdî hêdî hirç xwe nêzîkî Zeyno kir û ji hindirê torbê li ser mê xwe danî erdê, henek pêxwarin derxist û danî li pêşiya Zeyno û bi destê xwe jê re nîşan di da ku bixwe.
Zeyno û ji ber ku wê dizanîbû ku wê demeke dirêj di vê rewşê de bimîne, lewma biryara xwe da ku xwarinê bixwe ji bo ku hêza xwe ya winda kirî careke din vegerîne û hemû hêza xwe kom bike ji bo ku dema fersendek bidestê wê bike ve bikaribe ji şikeftê bireve û careke din xwe bigehîne dê, bavê xwe û hevalên xwe.
Piştî çend roj-sal li ser Zeynû re derbasbûn hêdî Zeyno jî weke hirçan lê hatibû ewjî fêrbûbû ku weke hirçan xwarinê bixwe û xwe li ser erdê bê cil û cilik li ser komek pûşê hişk dirêjbike. Bidemêre Zeyno bû dayîka zarokan, ji ber vê yekê baweriya hirçê roj bi roj bi Zeyno xwirtirdibû û hêdî xwe gehandibû baweriyekî ku Zeyno nema hêdî direve.
Zeyno jî hêhî hêdî weke hirç dev ji xwe berdabû, pora wê gijomijo bûbû û cilên li ser bedena wê parçeparçe bûbûn û laşê wê dinava ax û gemarê de mor û gewr bûbû, ji ber vê yekê heçî ku Zeyno bidîta nedizanî ka ev ajale an mirove.
Zeyno êdî baş dizanî ku hirç kengî ji şikeftê derdikeve û çi demê dizivire, ji ber ku jiyana hirç û Zeyno

bûbû yek û ji wanre zarok jî çêbûbûn, êdî tiştekî kû hirç jê bitirse nemabû.
Rojekî ji rojan weke her car hirç ji şikeftê derket lê vê carê derê şikeftê nedaber,wê gavê Zeyno ji nêzîkbûnê hirç şaşomaşo dima û ji ber wê yekê bi ewlekarî û hişedarî hêdî hêdî xwe nêzîkî derê şikeftê kir û di ber keviya derê şikeftêre bi dizîka ve li hirçê dimeyzand,wêdemê didît ku vaye dûrê şikeftê ketiye. Wê demê rabû bibayê bezê û bidizîkave ji hundirê şikeftê derket û reviya.
Demeke dirêj bû ku çavê Zeyno ronî nedîtibûn û ji tirs û xofa ku hirç wê bibîne û wê bigre, lewma heyanî demekî di

Em vegerin li ser rewşa dayk,bav û hevalên Zeyno.
Piştî ku deverek nema, bav û dayîka Zeyno têde li Zeyno negeran û ew nedîtin,
Bû sedem ku kesî nizanîbû ka çi ji Zeyro hatiye ji ber vê yekê gelek galgal û axaftinên virde wirde di nava xelkê gund de diçûn û dihatin.

Henekan digotin ji ber ku Zeyno dinava keçikên gundiyan de ya herî xweşik û ciwanbû ewbû.Ji ber vê yekî hemû xortmortên di nava gund de li dora wê digeriyan, lewma ji hesûdî û zikreşiya hevalên wê ew li çolê kuştine û navxwede ev kiryara ku kirîn veşartine ji bo ku tu es pê nehise.

Ji milekî din ve jî henekan digotin ku gura ew kuştiye û laşê wê parçeparçe kirine.
Ji ber vê yekê dê û bavê Zeyno hêviyên xwe ji dîtina keça xwe qutkiribûn û xwe radestî qedera û belaya ku diser wan de hatî dikirin.

Piştî ku Zeyno hate ser hişê xwe û tişta ku hatî serê wê yek bi yek anî bêriya xwe,gelek mereq û mitala dê, bavê xwe û keçikên hevalên xwe dikir û her gav li ser rewşa wan dihizirî.Serê wê gelek têşiya te digot qey qerabalixa dinyayê hemû têde diçe û tê, ji ber vê yekê xwe di cihê xwe de dirêşkir.
Lê dikir û nedikir xew nediket çavê wê û tim li ser rewşa ku ketî têde dihizirî û digeriya li rêûrêbazên ku bikaribe xwe ji vê belayê xilasbike û her gava ku dixwest çavên xwe deyne li ser û bikeve xewê, xewnên weke kabûsan êrîşê xeyal û remanê wê dikirin, ji ber vê yekê her tim divejniqî, dibizdiha û xew lê diherimî .Zeyno dinava xewn û xeyalan de diçû û dihat weke ewrên buharê yên ku her carekî komî ser hevdibin û belavdibin ji ber vê yekê gelek caran, geh bi xeyalê xwe diçû male, li cem keçikên hevalê xwe û geh dayk û bavê xwe tanîne bîra xwe. Li ser dengê kevirê li ber derî dihate kaşkirin û ronahiya dikete hundirê şikeftê Zeyno ji nava xewn û xeyalên bê qeyd û bend careke din vedigeriya hundirê şikefta tarî, cemidî û bêdeng.



ji bo çêkirina xaniyê xwe bixweze hertiştê ku tu dixwazê ezê ji tere bicihbînim qet mereqan neke.
Destê zêrîn ji keşe çil zilam xwestin ji bo lêkirina xaniyê xwe û keşejî di derhalde bê pirs û bersiv pejirand.
Heçî ku keşebû dizanî ku Destê zêrîn layîqê hertiştê başe, lê kesê ku li derdorê keşe ji aqilmendên wî, her demekî dema ku keşe daxwaze Destê zêrîn dipejirandin dikirin xirecir û jêre digotin: Herî erdê me yê xweş bir ji xwere û hîn jî çi zilaman ji me dixwazî, lê keşe tim bersiva wan dida û ji wanre digot: Bile bigre hêjaye û zêdejî.
Destê zêrîn temenê kelhekî dikola û bikeviran saxlem dikir û dema ku karê xwe xilasdikir ew dikuştin û salox ji hakimre şiyand û jê çil zilamê dî xwestin. Keşe jê pirsî mane min çil zilam ji tere verêkiribûn. Destê zêrîn ji hakimre got: Ew çil zilamê ku te ji min ra verêkirî dîwarekî xaniyê min hîn temam nebû hemû westiyan û reviyan, wê demê keşe jêre got temam.
Her carekî rexek ji kelhê avadikir û nedihişt ku bê bizanin ku ew dixwaze çi avabike. Ji ber vê yekê weke hercar çil zilamê dî ji hakim xwestin û bivî awayî hêtê kelihê bi wan avakir û temam kir.
Bivî awayî kelha xwe temamkir û dihindirê kelihêde bi rengekî barestî gelek mal û xanî avakirin û ji keşere got: Weke ku tu dizanê pêdiviyên min bixwarin, qût û dexil heye, piştî ku biqasî jêre pêwîsbê xwarin û qût bir ji hakim re got: Daxwaziyeke min ji te heye ku heçî ku eslê xwe Kurdbin bile hemû werin li dev min bijîn û em bihevre jiyan bikin, hakimm ew xwesteka wêjî pejirand.
Dema ku Destê zêrîn hertiştê xwe temamkir û hawîrdorê xwe saxlemkir.
Di wê navberê de wezîrekî hakim hebû û gelekî ji Destê zêrîn aciz bû lewma dikete bin guhê hakim û jêre digot: Hakimê min Destê zêrîn komarek ji xwere di rex komare me de çêkiriye, ma qey hayê te jêheye an na û ez bawerim wê sibe cihê mejî ji me bistînê li gorî ku tê xwiyakirin wiloye.

Roj bi roj kelkê kurmanc yê ku Destê zêrîn ew kirin xwedî mal û milik û şoxil bitir bûn û hin bi hin bela xwe li xelkê girêdayî hakim didan tengezarî û hizûrsizî ji xelkê bajêre dertêxistin.
Roj bi roj ji ber kiryarên kesên kurd yê ku Destê zêrîn li dora xwe komkiribûn û bi bavdora wezîrê hakim yê ku her gav û sehet weke mêşan li ber guhê hakim dikire vine vin, hakim qanih dike ku Destê zêrîn hêdî bitir bûye û kes pênikare û ûisa berdewambike û jiyanê ji mere nehêle; lewma were em bi nexşeyakî û hîleyekî wî vexwênin li ser xwarinê û em xwe ji şer û bela wî xilasbikin. Heçî ku hakime ji ber ku gelek ji Destê zêrîn hesdike û naxwaze wî bikuje lê wezîrê wî bandorekî giran li ser wî dike, lewma ewjî telî wî dibe û pîlana wî qebûl dile. Dema ku dehwet name dighîje destê Destê zêrîn di derhalde têdighîje, lewma ji hakimre verêdike û dibêje heçî ku hevaltiya min dipejirîne pêwîste ew were mala min, mala min ji wanre her dem û wext vekiriye.
Wê demê yê wezîr ji hakimre dibêje min ji tere negot tişta ku em jê ditirsan evbû te xwe biçavê xwe dît û biguhê xwe bihîst, em bihîla û bîlanan nikarin Destê zêrîn enceq em bihêza xwe ya leşkerî wî tunebikin.
Wezîr radibe ser xwe û hemû artêşa xwe dide pey xwe û dora kelha wî dikin çemberê, çiqa gazî Destê zêrîn dikin û jêre dibêjin xwe radestî me bike lê Destê zêrîn napejirîne.
Destê zêrîn cihê xwe pir saxlem kiriye û ji ber vê yekê qet tirsa xwe jiordiya hakim û wezîrê wî nîne.
Hêzên hakim bi hemû çekên xwe yê sivik û giran li kelhê têxin roj û şev bi qasî sê mehan kelhê têxine çemberê lê qet tu bandor li ser kelhê nabe û kes ji kelhê dernakeve, ji ber ku ji hemû milîve pêdiviyên xwe ji teqemenî, xwarin û vexwarinê ji bo sala amedekirine û xema wa tiştek nîne.
Ji ber wê yekê bimehan li ber xwe didin ne şerdikin û nejî ji hindirê kelhê derdikevin, lewma hakim û wezîrê xwe ji rewşa Destê zêrîn û xelqê wî matmayî dimînin û têjnagihin sedemê vê yekê çiye û hêza wan ya ku wan li ser piyan digre çiye. Ji ber vê yekê ji ketina kelhê û xistina wê bêhêvî dibin



Em vegerin li ser mesela hirç û Zeyno.
Dema ku hirç Zeyno girt û revand.Bi xwere bir cihekî dûr û bilind ku riya tu mirovan bi hesanî nagihêjiyê.Hirçê gewir Zeyno danî li ser milê xwe û berê xwe da şikefta ku têde disekine.Şikeft li cihekî bilind li pesara çiyayekî bû û cihê şikeftê bir saxlem û asêbû.Dema ku hirç xwe gehande şikeftê û Zeyno li ser erda şikeftê ya ku bi paçekî Kevin raxistibû dirêjkir hêjî Zeyno ji bandora hingaftina ewilî ya ku girtî dema ku ketî destê hirç de  xilas nebûbû.Piştî demekî dema ku Zeyno hate ser hişê xwe û bi çavên xwe yê nîv vekirî derdorê xwe temaşe dikir lê dikirûnedikir nizanîbû ku li kudiye û kî ew aniye vê deverê,dema ku xwest rabe li ser xwe
nikarîbû laşê xwe ji erdê rabike,te digot qey laşê wê bê reh û xwîn maye.
Ji nişkîve deng ji deriyê şikeftê hat û siya tiştekî bilind derbasî hindirê şikeftê dibû.
Hirçê gewr derbasî hindirê şikeftê bû.Xwe hêdî hêdî nêzîkî Zeyno kir, Zeyno ji nişkîve vejniqî û dîse kire qêrîn û hewar lê dengê Zeyno dîwarê şikeftê derbasnedikirin û nedigihîşte tu deverî.Hirç rahişte Zeyno û henek pûşê nerim raxiste bin cihê wêde û dîse ew li ser cihê wê dirêşkir,peyre henek xwarin û vixwarin jê re anî û danî li ber wê û xwest ku destê xwe bi serê wê de bîne;lê Zeyno serê xwe jê dûrkir û xwe da milekî û destê xwe qet dirêjî xwarinê nekir.Dema ku tarî kete li ser rûyê erdê hirçê kewir kevir ji ber derê şikeftê da milekî û ji şikeftê derket piştî ku li pey xwe carek din kevirê li ber derê şikeftê vegerande şûna berê.Gava ku Zeyno pêhisiya ku hirç ji şikeftê derket,rabû ser xwe da ku rêkî bibîne û ji hindirê şikeftê derkeve;lê çiqas geriya û negeriya tu rê ji bo derketina ji şikeftê nedîtin.Tenê riyek heye ew jî deriyê şikeftiye;lê belê hirçê  ew bi berekî mezin dadaye ku deh zilam jî werin nikarin wî berî ji ber derê şikeftê bidin alî. Ji ber vê yekê Zeyno mecbûr dima ku xwe radestî qedera ku biserê wê de hatî bike heyanî rojekî ji rojan firsendê bibîne û ji hundirê şikeftê derbikeve.

hev dûrketine.Heyanî tarî kete ser rûyê erdê û bû çaxê vegera male.Li ser vê yekê her yekî ji wan berê xwe dana malên xwe.Lê ji ber ku dinya tarîbû kesekî nedizanî ka kî ji wan hatiye malê û kî nehatiye malê. Zeyno ji ber ku bi vedana pincaran ve mijûl dibû, pê nedizanî ka lingê wê, wê bi ku ve dibin û nedizanî ku hevalên wê hemû çûne male û ew bitena serê xwe li çol û beyaran maye. Dema hevalên Zeyno berû malê xwe ve diçûn bi çend dengan gazî Zeyno dikin lê ji ber ku tu bêjin û dengê ji Zeyno nehat,wen texmîn kirin ku ew bi tena serê xwe vegeriyaye malê.

Dema hevalên Zeyno hemû vegeriyan malên xwe.Weke her dayîkekî û bavekî bav û dayîka Zeyno jî mabûn li benda hatina keça xwe.Lê dema dinya tarîbû û tu bêjna Zeyno nehat, dayîka Zeyno kete nava livûtevgerêde û dakete nava gund ji bo bizanibe ka keça wê li kudê maye.

Yek bi yek dayîka Zeyno ji hemû hevalên wê pirsyara Zeyno kir;lê hemûyan jî texmîn dikirin ku Zeyno hîn li pêşiya wan gihiştiye malê .Ji ber wê yekê, dema hemî hevalên Zyno têgihiştin ku ew negihîştiye malê,heman û bi bayê bezê hemû bihevre ketin nava liv û tevgerê ji bo dîtina Zeyno. Heyanî berdestê sibehê dayîka Zeyno û hevalên wê li Zeyno geriyan û tidever neman ku lê negeriyan;lê ne bêjin û ne saloxek ji wê negirtin û bi dilekî xemgîn vegeriyan malên xwe.Em vegerin li ser rewşa Zeyno.

Zeyno bi komkirina giya û pincaran ve mijûl dibû û hingî dûr çûbû nêzîkî kuna hirçê bûbû wê;lê wê xwe pê nizanîbû kû kuna hirçê li wê deverê ye.

Ji ber wê yekê Zeyno ji nişkan ve xwe dîtûnedît ku dinava lepê hirçekîdeye;çiqa dike gazî,hewar,nalîn û girî lê heyfûmixabin feydenîne ji ber ku hemû hevalê wê jê dûr ketibûn û kesekî ku bihewara wê ve were tunebû.

Bi derketina şefeqê re hemû xlqê gund diserî de dayîk,bav û hemû hevalên Zeyno li çol,beyar û qelaçan belavbûn û tu dever nehiştin ku lê bigerin.Lê mixabin bêku dewsekî an şopeke Zeyno bibînin hemû bi dilekî şikestî û xemgîn vegeriyan malên xwe.



û kardikin şûnde vegerin, lê ji nişkîve dimeyzênin vaye kesekî nameyek ji wanre aniye, ewjî kurmamê Destê zêrîne. Piştî ku kurmamê Destê zêrîn jiana xwe digrê saxlimiyê, ji wanre kaniya hêza Destê zêrîn dide nîşandan û ji wanre dibêje ger hûn avê li ser wan qutnekin û bi mehan û salan jî şerê wan bikin hûn tucaran bi wan nikarin û hemû hewildanên we, wê pûç û valebin.

Ji ber ku çiqa gelê di hindirê kelhê de bê xwarin bimînin wê îdare bikin lê dema ku av ji wan qot bibe nikarin bijîn û wê hwmû xwe radestî we bikin û hûnê serbikevin.

Hakim û wezîrê xwe tişta ku kurmamê Destê zêrîn ji wanre vegotiye yek bi yek têxin meriyetê û çend pezan li serê kaniya ku av jê diçe hindirê qelê û av hemû bû xwîn, dema ku Destê zêrîn xwîna dinava avêde dît dicihde got xiyanet kete nava mede û em çûn, ka meyzênin ew kiye xiyanet li me kir.

Digerin û nagerin kur mamê Destê zêrîn nixweyaye wê demê tê digihin ku hêdî dawiya wan tê.

Ji milekî dinve dema ku hakin kurmamê Destê zêrîn dibînê jêre dibêjê çime piştî hewqa qencî û hevaltiya Destê zêrîn bitere kirî, te çime rabû gilhê wî li cem me kir û te xiyanet le wî kir. Wê demê kur mamê destê zêrîn ji hakimre mebest û amanca xwe jêre ravedike û dibêje min pevjîna wî divê û daxwaza min ewe ku hûn piştî xistina kelhê pevjîna wî bidine min, wê gave yê hakim ture dibe û ji dînê xwe derdikeve. Raste yê hakim şedê Destê zêrîn dike lê ji kiryara kurmamê wî jî gelek matmayî ma û jêre got: Piştî ku te xiyanet li kurmamê xwe kir û li gelê xwe kir piştî hewqa qencî û başî sibe tuyê bimin jî xiyanetê bikê û tu bimerejî nabe dost û heval;lewma ew parçe parçe kir û kire devê lûla topêde û ew biser kelhêre dûr avêt û ji xwere got bile cezayê her kesê xayîn û xwefiroş ev bê.

Piştî ku hakim salox ji Destê zêrîn re verêkir û jêre nîşanda ku wan av li ser wan qutkiriye û jiyan ji wanre nemaye ji ber vê yekê ji wan xwest ku xwe radestî wan bikin û dev ji berxwedana xwe berdin.

Lê Destê zêrîn û gelê xwe li ber xwe didin û xiyanetê layîqî xwe nabînin û hemû ji tîna dimrin û Destê zêrîn heyanî dawiyê dimînê û deriyê kelhê ji hakimre venake û bi qehremantî dimre.
Lewma mirov biçavê xwe dibînê, çiqa zanebûn, şehrezarî û aqil mendiya mirvan hebe, lê xiyanet weke ku pêşiyn me dibêjin "kurmê darê nej darêbê vena darê nîne."
û dawiya kesê xayîn wê weke kurmamê Destê zêrîn bê û didîrokêde wê tim cihê nehlet û rûreşiyê bê.



## ZEYNIKA ZÊRA

li gundekî moxtarek hebû û keçeke wî bi nave Zeynê hebû.Ji ber ku Zeynê hîn ciwan bû û pir nazdar bû her roj xwazgîniyê wê li pey hev dihatin û dixwastin ji wan re bibe nesîb.Lê Zeynê kesek ji wan jî nedieciban.

Zeynê ji ber ku pir dihate heskirin dinava hevalên xwe de her roj bihevre ew û keçikên gund diçûne çol û beyaran ji bo komkirina kerenk, tolik,sîrik,sitirîzerik û hrw…

Jiyana wan bihevre,pir xweş derbasdibû ji ber ku Zeyno jî pir ji hevalê xwe hesdikir û tim dixwest bi wanre biçe çol û qelaçan ji bo seyranê, keyf,henek û yariyan bihevre bikin ji derketina rojê heyanî êvariyan.Nemaze dema bihar dihat û xweza xwe wek bûkekî dixemiland bi hemû rengên gulan yên ku bêhin û embera wan ji her deverî dihat, li ber dengê şalûl û bilbilên ku govenda dehil,devî,zinar û çiyayan digerandin.

Dinava vê xwezaya xweş û sipeyîde her tiştî ji nûve xwe bi hatina buharêre dixemiland li ber bayê zozana yê hînik û sivik,roj zû û xweş li ber çavên mirov derbasdibûn bê ku mirov zanibe çawe derbasdibin.

Zeyno roj bi roj kamil dibû û bibejin,bal û xemla xwe hîn ciwantir dibû û aqilê xortan direvand.Ji ber vê yekê dildar û xwazgîniyên ku dihatin destê wê ji bav û dayîka wê dixwestin qet ji mala wan qut nedibûn. Bavê Zeyno û ji ber ku xwazgîniyên keça wan bê navber diçûn û dihatin, şaşomaşo mabûn ku keça xwe bidin kî û nedin kî.

Rojek ji rojan dema weke heroj Zeyno tev hevalên xwe bikêf û şadî diçûne çol û eqaran ji bo komkirina pincaran û dema ku heryekî ji wan bimilekî ve belav dibû ji bo komkirina pincaran û ji ber ku her yekê ji wan bi vedana pincaran ve mijûl dibû hayê wan ji hev nedima ka çiqasî ji

derxistibû lewma nedixwest bikeve eînî şaşîtiyê de û careke din şêrînê li ber dilê xwe winda bike û herdû bibin qurban.

Çiqas ku bablîsok xurtir dibû herdûyan jî hîn bêtir xwe biheve dikirin yek can û yek reh ku tu hêzê nedikarî wana ji hevdû veqetîne.

Çiqas pîra sahir xwest ku herdûyan ji hev veqetîne lê çiqas kir û nekir nedikarî biser bikeve beramberî du dilên ku bûne yek deng û yek rih. Wê demê pîra sehar têgihişt ku herdu ji dil û can ji hevdû hesdikin û tu hêz li ser rûyê dinyayê nikare wan ji hev veqetîne. Lewma pîra sahir hate rûbirûyê wan û herdû dehwetî hizûra xwe kirin. Piştî ku herdû vageran weke berê û pîra sahir bi çavên serê xwe xweşikbûn û delaliya wan dît ji ber wê yekê biryara xwe da ku wan azad bihêle û êdî bela xwe ji wan veke ji ber ku herdû layîqê hevin.

Ji wê rojê û şûn de Qoqo û keça padîşah bihev re vegeriyan welatê xwe li cem bav û diyên xwe û jiyana xwe ya mayî dinava xêr û xweşiyêde domandin.



## BERIKÇÊKER

Zilamek hebû pir biaqil bû û xwedî gelek zanebûn û têgihiştî bû û her karê dinê dizanî û jê têdigihişt. Ji ber vê yekê xwest ku tiştekî nû biefirînê, lê kes pê nizanîbê û bi wîre nebê şirîk û heval, ji bo ku ji wî fêrî senhetê nebê û ew her li ser karê xwe bê heya ku bimrê û kes ji destê wî wî karî negrê û ji xwere bikarneynê.

Xwest didespêkêde debabeyekî çêbike anjî firokekî çêbikê, lê didawiyêde xwest ku beran çêbike û ji xwere got ez dikarim bitena xwe jî beran çêbikim û pêdiviya min bikesî nîne û en karê ku ez têde qezenc bikim eve. Wêdemê ji ber ku ber kêmbûm û bihabûn lewma heroj ji xwere berek çêdikir û dibire zûkê difrot, lê biderbasbûna demêre, ji ber ku zilam bitena xwe bû dixwest ku kes li cem wî hebê jib o ku wensa xwe pê bînê û jiyana wan xweş û bikîf derbasbê. Ji milekîve dixwest keshebe ku wensa sebra wî pê were û wensa wî bê were, lê ji milekî dinve ditirsa ku ew kes ji wî fêrî çêkirina beranbê û ji wî baştir beran çêbikê, wê demê ew bimînê bê kar û îş. Rojekî ji rojan berê xwe da sûkê dît ku vaye xek û alem hemû li dora tiştekî kombûne û qerebalixa wane.

Zilamê gewr mereq kir ku çi li wêdê heye ku evqa elalet li hev kombûne, ji ber wê yekê berê xwe da komê û xwe bikotekî dinav wanre derbasî bêşkirin ji bo ku baş bibîne çi li wir heye. Dema gihişte pêş dît ku vaye zilamek meymûnek pêre û didestê wîde qamçiyek heye û li meymûn dixîne û jimeymûnre dibêjê reqsa pîra bike, hevîrê pîra bistire dinava xelik û alema ku ji xwere pê dikene û pera didine xwediyê

meymûn. Zilamê berçêker dilê wî bimeymû şewitî û ji xwere got ma qey çi pêveye ku ez meymûnekî bibim cem xwe û pê wensa xwe bînim. Bivî awayî ezê hem wî ji vê eşkencê xelasbikim û hem ezê ji milekî dinve wensa xwe pê bînim û hem ew tikarî ji min fêrnabê û ji xwere hizirî û got ku xwediyê vî meymûnî wî bidê min wê pir başbê. Ji brt vê yekê dema herkesê kombûyî belav bû ji xwediyê meymûnre got: Tu vî meymûnî nadê min an bifroşê min, yê xwediyê meymûn bersiv dayê û got: Ezê çawe meymûnê xwe bidim te, ji ber ku jiyana min û zarokê min li ser vî meymûniye û dema ku ez mrymûnê xwe bidim te wêdemê ez karê xwe didime te û hingî ezê bimînim bêkar û zarokê min wê jinêza bimrin. Wêgavê zilamê berik çêker ji xwediyê meymûnre got: Ezê bihayê wî gelek dirav bidime te ku têra te û zarokê te bike heyanî salekî din û tu biwan jî ji xwere karekî bibînê û pê biriziqê. Didawiyê de mirovê berik çêker xewdiyê meymûnê qanihkir û meymûnê xwe girt, bire malê. Gelek qedir û qîmeta wî girt û jêre tişta dilê wî bixwazê ji moz, sêv, pirteqal û tişta heyî anî û danî ber devî wî.

Meymûn gewr ji xwere rûniştîbû, dixwar û vedixwar û li zilamê berikçêker dimeyzand û ji xwere got: Ma min çi qencî ji vî zilamîre kiribû heyanî ev qencî bi min kir, mane min şev û roj lêdan dixwar û jiyana min weke dojeheke bêser û binbû û wî ez anîm û kirim nava vê buhiştêde, rûniştî û razayî tenê karê te xwarin û vexwaribe.

Piştî demekî ji xwere hizirî û got:Ezê çawe bersiva qenciya vî zilamî bidim. Piştî demekî ji xwere got: Encex ez alîkariya wî berançêbikim û bivî awayî ezê karibim barê wî henekî sivikbikim. Ji ber kû meymûn pir zîrekbû û weke şeytanan bû, lewma zû fêrî berçêkirinê bû, dema ku zilamê berikçêker ji bo pêdiviya karekî derkete ji derve û dema ku ji nişkîve zivirî, dît ku vaye meymûn wê li ser berika wî rûniştiye û wê cihê ku zilam sekinî temamdikê. Dema ku zilam dihna xwe da karê meymûn şaşomaşo ma û dît ku vaye karê meymûn ji karê wî paqijtire.



ramûsanan û ji wanre got hûn dikarin cihê wê bîrê nîşanî min bidin. Wê gavê tişta ku dilê we dixwaze ezê ji were bicihbînim.

Kurê ciwan û bavê xwe cihê bîrê ji keça padîşahre diyarkirin û xwestin ku keça padîşah destûra wan bide ji ber ku riya wan dûre û dirêje. Çiqas ku keça padîşah xwest ku çend rojên din jî li cem wê bimînin û bêhna xwe baş vedin lê wan ev yek nepejirandin û ketin ser riya welatê xwe, piştî ku rabûn bi dilekî kêfxweş û şadî xatirê xwe ji keça padîşah xwestin , berê xwe dane felekê û pişta xwe dane oxirê.

Keça padîşah ji keyfa nizanîbû çibike rabû weke bablîsokê xwe birêk û pêk kir û du hişedar jî bi xwere birin. Birengekî veşartî xwe berda binê bîrê û xwe gehanda oda ku hersê text têde bicihdibûn. Keça padîşah rabû û xwe xiste bin textê zêr de biyê ku kes pê bihese. Rojek du roj derbasbûn keça padîşah didît ku xwediyê textê zêr xwarina xwe naxwe û gelek kul û derdên wî komî ser hevdûbûne, ji dengê wî pê derxist ku ew delalê li ber dilê wê ye. Libendê ma heya ku xwediyê herdû textên din ji odê derketin û ji nişkîve derket beramberî delalê xwe. Wê demê herdûyan ji dil û can hevdû hembêzkirin. Qoqo ji keça paşêre got dayîka min pîra sehare û xwedî hêzeke mezine ku kes nikare li beramberî wê bisekne. Dema ku bêhna mirovan bike wê me herdûyan bi hevre bikuje. Ji ber vê yekê heme pêwîste em zû ji vê derê derbikevin û birevin berî ku dayîka min bi me bihise. Dema ku Qoqo û pevjîna xw gihiştin serê bîrê, wê demê pîra sehar bi wan hisiyabû û wê jî bi wanre xwe gehande serê bîrê. Pîra sahir bi bablîsokeke pir dijwar û har xwe li nav guhê herdûyan da ji bo ku wan ji hevdû qutbike lê Qoqo xwe kire dar û keça padîşah jî ji qodreta yezdanê mezin bû mar. Herdûyan xwe li hev alandin. Qoqo ji keça padîşa re got: Çiqas bablîsok xurtbibe û dijwartir bibe pêwîste ku tu qet xwe ji min bernede, ger tu xwe ji min berdê vê carê hêdî qet em hevdû nabînin û em hedûjî ji vê dinyayê windabibin. Keça padîşah ji cara derbasbûyî wane

biderbekî zimanê wî vebû û wke çemekî biherike, dest bi axaftinê kir bê navber û rawestandin.

Mirovê kal nedixwest ku serê wan têkeve dinava qeza û belayan de ji ber vê yekê devê xwe ji ser hev ne dilivand; lê kurê wî serê werîsê axeftinê jê sitandibû û dest bihûnandina gotinan ji keça padîşa re dikir.

Kurikê gewir dest bi vegotina çîroka xwe û bavê xwe dikir û vedigot: Rojek ji rojên kela havînê yên germ weke agirê dojehê em dimeşiyan û ji tî û birçîna hêz û taqeta me nemabû, ji nişkîve em rastî bîrekî hatin. Wê gavê me xwest ku em henek av ji bîrê vexwin, lê ji ber ku bîr kûr bû pêwîst bû ku yek ji me xwe berde binê bîrê û henek av ji mer bîne nexwe emê ji tî û nêza bimrin, wêgavê min gote bavê xwe ezê xwe berdim binê bîrê de. Bavê min rabû ez bi werîsekî ve girêdam û min şerbikek girte destê xwe û ez daketim binê bîrê ji bo ku em henek av ji xwe re peydabikin pê tîna hinavê xwe bişkînin, berî ku ez dakevim binê bîrê bavê min ji min re got: Dema ku tu gihiştî avê û te şerbikê xwe tijî av kir wê demê werîs berû xwe ve bikşîne da ku ez te berû jorde bikşînim. Lê dema ku ez gihiştim binê bîrê bûm min çi dît û çi nedît vaye dibinê bîrê de bajarekî bê serîûbinî bicih dibe. Wêgavê ez şaşomaşobûm û ji bo ku kes bi min nehise û min nebîne bibayêbezê min şerbikê xwe tijî av kir lê ji bo ku ez henek pêxwarin jî ji xwere peydabikim, ez ketim hindirê odeyekî de min dît ku dihindirê odêde sê texit diberhevre rêzkirîne; textek ji wan zêre, yek ji wan zîve û yek jê jî kirome; lê tişta herî bala min dikşand ew bû ku xwediyê textê zêr xwarina xwe nedixwar û hemû têxiste bin textê xwede, sankî nexweşbû an derdekî wî hebû. Ji ber ku ez ditirsiyam ku henek min bibînin û min bigrin. Lewma min xwe dereng nexist û hema min bibayê bezê û bidizîka henek pêxwarin kire nava cemedaniya xwe û min werîs berû xwe ve kişand ji bo ku bavê min, min ji bîrê derxîne. Bikinahî û kurtasî halûmesala me evbû.

Keça padîşah bi vegotina kurikê ciwan şadbû û kîsek zêr xistine nava destê wî û herdû aliyê rûyê wî dane li ber



Zilamê berikçêker ji xwere hizirî û got: Pir başe ji bo min, berê min rojê berek difirot lê ezê êdî rojê du beran bifiroşim û qezenca min wê bibe duqat.

Piştî demekî dema ku zilamê berçêker zengîn bû û bû xwedî mal û milk ji xwere got: Mane vaye meymûn dişuxilê, ji bo vê yekê pêwîst nîne ku ez êdî karbikim û dem hatiye ku ez henekî ji xwere fehesim.

Zilamê berik çêker her roj ji meymûn re xwarina wî tanî oda wî û berê xwe dida oda xwe, lê vê carê ji bo ku xwe rehetkê û her roj bera ku meymûn çêdikir dibir û difrot; lê rojekî meymûn lê anî der û ji xwere got: Vî hîleke xweş li min kir û ez xapandim, min ji xwere got: Ezê qenciya wî li ser mile xwe bavêjim, lê wî ez ji xwere kirim kole û ji xwere got halo bivîre nameşê ku li ser pişta min bijî û kêfêbikê çikir. Meymûn rabû roja din berik beropaşo çêkir û dema ku zilam berik bir û xwest bifiroşê, lê yê dikandar ji bo ku berik berovajîbû jê nekirî. Bi vî qwayî roja dinjî meymûn berik vajî çêkir û ya dinjî. Zilamê berikçiker ji bo vê yekê gelek bêçare bû û nizanîbû çibikê, ji ber êdî fêrî rehetiyê bûbû û destî wî hêdî ji kar nedigirt.

Dixwest ku ew reheta xwe bistîne û meymûn jêre karbikê lê meymûn ev yek nepejirand. Zilamê gewr kete nava duriyande destê wî hêdî ji kar nagirê ji milekî ve û ji milekî dinve destê wê ji meymûnê wî qutnabe, aniha berdê meymûnê xwe piştî ku jê fêrî berikçêkirinê bû, wê biçê û berikan ji wî çêtir çêbike û bifroşê wê gavê ewê bêkarbimînê û herê jî wê bê wens bimînê.

Zilamê berikçêker çiqas biaqilbû lê kir û nekir ji xwere care ji xwe û meymûnê xwere nedît.

Piştî demekî hizirî ji nişkave hevalekî wî hate bîra wî, wê demê ji xwere got: Hebê nebê wê ewê çarekî ji meseleya minre bibînê; lewma rabû ser xwe û berê xwe da cem wî. Piştî ku xwe gihande cem hevalê xwe, hevalê wî piştî xêrhatina wî kir, li hal û hewalê wî pirsî. Zilamê berikçêker: Birastî tu bixwazî ji milekî ve min pir bîra te kiribû û ji milekî dinve jî pirsgirêkeke min heye min got berkî tu ji

minre çareserbikî. Zilamê berikçêker ji hevalê xwere hal û meseleya xwe û meymûnê xwe got. Hevalê wî jêre got: Tenê çarek ji meymûnêtere heye ewjî ewe ku tu pazekî li berzanê bînê malê û tu nahêlê ku ew berxika ku zayî ji dayka xwe bifirşik bê û ji dila ku tu şîr bidiyê tuyê li ser ava moz, leymûn û pirteqalan bidiyê. Wêdemê ew berxikê te wê disê çarheyvan de mezinbibê û kesê kû wî bibînê nasnakê ku berxe, wê demê tê biçê wî bibê li cem meymûnê xwe û tuyê bixwere qamçiyekî bibê û tuyê ji berxre bibêjê ka rabe berekî çêbike, ma ber çizanê berikê çêbikê, tu sed salî ji pêşve beran çêbikê ew fêrnabe û nizane çêbike. Wê gave wexta ku çênekir tuyê rahêjê qamçî û tuyê lêbixê. Ew berx tştekî ji te tênagihê wê tenê deng derxê, wê demê tuyê wê serjêbikê, hingî meymûnê teyê bersiva te bidê yan wê beran çêbikê yan tuyê destûra wî bidê ku nikarê beran çêbikê.
Ji hevalê xwere got: Temam û tişta ku jêre pilan kirî yek bi yek pêkanî. Wê gavê meymûnê wî jêre got:Min nejkêrê min jiberê û ji wêrojê de meymûnê me berançêdike û zilamê me dixwê û vedixwê û dirazê, heyanî ku meymûn xwest ku qenciya wî li ser xwe rakî, wî ew ji xwere kir kole û daşixwlandin. Lewma çiqa ku tu bibêjî ez biaqilim ji te biaqiltirjî hene.



germa ku dibariya qey agir bi axê ketiye. Wê demê roj berû nîvro ve dçû zilamekî extiyar û kurê xwe dibûne qasidê konê keça padîşah. Dema ku çavê keça padîşah bi wan diket weke ku
sedkes jêre bibêjin hebe nebe bivanre saloxek an jî mizgîniyekî ji minre heye. Ji ber wê yekê gelek qedir û qîmetê wan digirt û
xeber da hişedarên xwe ku ji wanre pezekî şerjêke û şîva wan dirist bike. Çiqas ku zilamê extiyar ne dixwest zêde li bin konê keça padîşah dereng bimîne û çend caran xwest ku birêbikeve, lê keça padîşah ji wanre got: cewelahî bilahî heyanî ku hûn şîva xwe nexwin ez nahêlim ku lingê we ji bin konê min bilebite, ji ber ku ev çend salin ku min konê xwe li ser vê rêkê vegirtiye û heyanî neha min nehiştiye ku kes bê xwarin û vexwarin ji bin konê min birêbike ve.
Lewma ecele nekin, cihê xwe xweşbikin, xwarina xwe bixwin û bêhna xwe vedin, pey re hûn bikêva xwe ne hûn dixwazin biçin an îşev li cem mebin hûn serbest û azadin, konê me mezine û têra me hemûyan heye. Keça padîşah rabû bidestê xwe ji wanre çayî danî li ser agir û heryekî ji wan çend balîf danîne ber pişta wî û cihê wan xweştirkir û li civata wan rûnişt.
Heyanî ku xwarin diristdibû hêdî hêdî keça padîşah ji wan gelek behisûxeber girtin û çîroka xwe jî ji wanre rêzkiribû.
Kurê mirovê extiyar her gavekî destê xwe li kêleka pavê xwe dixist, weke ku dixwaze tiştikî nepenî bibêje lê bavê wî her gav bidengekî nebihîstî ew bê deng dikir. Vê yekê gelek bala kaça padîşah dikşand. Ji ber wê yekê ew vexwande milê xwe û destê xwe biser serê wîre birûanî û çayeke zelal û şêrîn danî li ber wî û jêre got: Rehetiya xwe bistîne weke ku tu li mala xweyî û li cem dayka xweyî, qet şermneke û tişta ku di dilê te de heyî ji minre bibêje.
Piştî ku keça padîşah cihê wî hîn xweştir kir û çayekî danî li pêşiya wî.
Ji ber dilnizmiya keça padîşah û ji ber qedir û qîmeta ku ji wanre hatî nîşandayîn, korê mirovê kal

jê negre, lingê wê bi vê malê nakeve. Piştî ku hewara xwe gihande bavê xwe û çend hişedarê bavê wê yên ku baweriya bavê wê biwan tê, amedekirin ji bo ku bêre bikevin rê û alîkariya wê bikin pêre şiyandin, wêdemê keça padîşah karûbarê xwe kir û xatir ji dayîka Fatê û bavê xwe yê ku cara yekemînbû ku bibîne rondikan dibarîne. Li ser riya xatir xwestinê, padîşah ji hemû hişdarên ku keça xwe emanetî wan kirî re vegot: Keça min emanetî we ye ger tiştek bi serê wê were bile çavên min bi we nekeve; wê demê hûn xwe dikujin bi kûve direvin, çij ji xwe dikin hûn dizanin.

Kerwanê keça padîşah birêket, pişta xwe da oxirê û berê xwe da felekê.

Keça padîşah gelek çol û çolistan derbaskirin, biroj û şevan dimeşiya bê ku navberkî bide meşa xwe, heyanî ku gihîştin navenda gehandina hemû xaçerêkên bazirganan. Wê demê keça padîşah biryara xwe da ku konê xwe li ser devê rê vebigirin û ji hemû kesên bazirgan yên ku diçin û tên û seranserê dinyayê levûtevdidin bipirse dibe ku em saloxekî ji Qoqo bibihîzin.

Keça padîşah ji ber heskirina wê ya bê sînor ji

Şêrînê li ber dilê wê re hebû, bi yekser bê ku xoleyekî jî raweste dest bi guhdarkirina bazirganên ku diçûn û dihatin dikir bi şev û roj bê ku xew bikeve herdû çavên wê û heçî mirovê ku dihate hizûra keça padîşah nedihişt ku ew bê xwarin û vexwarin ji bin konê wê veqetin.

Ji ber wê yekê hemû bazirgan jê memnûn û razî bûn û hercarê jêre ji Şamê, Helebê, Rohayê, Bexdayê û misrê diyariyên giranbuha bixweretanîn.

Lê xema wê ne mal, xêrûbêr û xweşiya dinê bû, merema dilê wê ya herî mezin ew bû ku saloxekî ji roniya çavên xwe şêrînê ber dilê xwe bigre. Gelek şev, roj, meh û sal di ser vê rewşa ku keça padîşah têde dijî re derbas bû, bê ku hêviyên xwe ji dîtina pevjînê xwe qutbike her ku ew tanî bîra xwe soz, ehid û biryara ku ji xwe re dayî nûdikir. Heya ku rojek ji rojan hat û dergehê hêviyan li pêşiya êş û azarên ku dikşîne vedibû. Rojek ji rojên havînêbû te digot ji kele



ESLÊ JINÊ JINE NEJMALÊ MEZINE

Rojek ji rojan Harûn elreşîd û pevjîna xwe li hevdû rûniştin û dinavbera wande guftuguhê destpêkir. Harûn elreşîd got: Eslê jinê jine lê nejmalê mezine. Sitya zîn lê zivirand û got: Nawele eslê jinê ji male mezine û got: Ji ber ku ez ji maleke mezin û bi esil û fesilim û mala me xwe dî cih û denge dinava xelik û alemê de, ji ber vê yekê ez hidsab dibim jin, lê jineke din yeke xizan û kes wê û mala wê nasnekê hisabnabe jin. Bi vî awayî herdû ketin qirika hevdûde. Harûn Elreşîd ma li ser ya xwe û Sitiya Zîn ma li ser ya xwe û ji hev xwyîdîn û heryekî ji wan berê xwe danê oda xwe. Rojekî H.Elreşîd ji xwere hizirî û ji xwe re got: Ezê S.Zîn dibin cerbandinekîre derbasbikim ka raste eslê jinê jine, an ji malê mezine. Mane heryekî ji H.Elreşîd û S.Zîn xizmetkarê wan ji hev cudane yê H.Ereşîd zilamin û yê S.Zîn jî, jinin. Lê rojek ji rojan H. Elreşîd ji xizmetkarê xwere got:Tê ji îro û bêde hersibeh taştiya S. Zibêde bibê jêre. Mane xizmetkarê H. Elreşîd jî gelek zilamekî xweşikbû û ji xweşik bûna wî ciwaniya wî ji mile herkesî ve dihate heskirin û bê çavînî te digot qey te sîvetê wî bi pênûsê xêzkiriye. Xizmetkarê wî jêre got: Ez xwarina wê jêre bibim. Çime mane xizmetkarê wê hene û jêre her pêdiviyên wê jêre bicihtînin û pêdiviya wê bimin nîne. Lê H. Ereşîd got: Na ji neha û pêve êdî tuyê xwarinê jêre bibê û bêwîste S. Zînê çawe nêzîkê tebibê tu ji minre bibêjê. Bivî awayî xizmetkarê wî daxwaza wî pejirand. Roja yekê xizmetkar xwarin bir û lideriyê

xizmetkarê S. Zîn de, dema ku derî lê vekir xizmetkara S. Zibêde ji ber bedewbûna wî ji serhişê xwe çû û kete erdê.S. Zibêde lê meyzand, lê dema ku çavê wê bi zilamê xizmetkat ket. Ne bidilekî bi sed dilî keyfa S. Zibêde jêre hat. Bû roja dî û yê xizmetkar dîse xwarin jêre bir, lê vêcarê S. Zibêde nehişt ku berdesta wê xwarinê ji destê wî bigrê, ewê bi xwe rabû xwarin ji destê wî girt. Xizmetkarê H. Elreşîd jêre got: Hal û mesele eve. Wê gave H. Elreşîd ji xizmetkarê xwere got:Xemnake S. Zibêde çi ji te xwest pêwîste ku tu li gorî diê wê tevbigerê û gotinên wê neşkînê. Roja din dema ku xizmetkar xwarin da dest S. Zibêde, S. Zibêde dema ku destê xwe dirêjî xwarinê kir destê xwe danî li ser destê xizmetkar, yê xizmetkar ji şerma rûyê wî sorbû û destê xwe ji nava destê wê kişand. Xizmetkar ji H.Elreşîdre tişta ku pêre çêbûyî vekir û jêre got: Êdî ez nema xwarinê jêre dibim. Lê H. Elreşîd got: Nabe tuyê dîse jêre xwarinê bibê û weke min ji tere gotî:Çi ji te xwestê qet dilê wê neşkîne. Heçî yê xizmetkare mecbûrma ku bibiya mezinê xwe bikê lewma ji neçarî dîse karê xwe berdewamkir.

Roja dî dema ku xizmetkat xwarin bir, S. Zibêde ji xadimre got: Keyfa min ji tere tê û bêwîste ku tu werê ji bo ku em hevdû bibînin, yê xulam jêre got:Temam yayanî min cihek dît ji bo ku em li wir hevdû bibînin ezê wêgavê bibêjim te û riya xwe girt û şûnve zivirî cem H.Elreşîd û Ji wî destûta hevdîtina S.Zibêde girt û jêre got:Ezê ji tere bibêjim biçin kuderêjî. Cihek heye ku em hespê xwe têde ditewilênin û êm didine wan, hûn dikarin biçin li wêderê hevdû bibînin û çaxê hevdîtinêjî ji wanre nîşanda û ji xizmetkare got: Ezjî ezê wê demê werim li wêderê,Lê pêwîste ku elmê S. Zibêde pênînbê ku ejî tême wêderê. Xizmetkar ji S. Zibêdare dem û cihê hevdîtinê kifişkir û li herdû li hevhatin. S. Zibêde kete milê bin mile xizmetkar û berê xwe dane axwira hespan. Dema ku derbasî hundirê axwirê bûn S.Zibêde ji xizmetkar xwest ku çekê xwe ji ber xwekê,yê xizmetkar ji S. Zibêdare got: Nabe yu mezina meyî û ji esil û fesilî, ji ber vê yekê nabe ez ewilî destpêkim, gerek tu ewilî destpêkê. S. Zibêde dibêdibêjê na



bihevre dinava xêr û xweşiyêde bijîn bê qeza û bela heyanî mirinê.

Soza ku keça padîşah dayî Qoqo hemû yek bi yek roja yekê û ya diduyan bicî anî. Tenê roja sisêyan mabû ku soza keça padîşah bicî were. Lê heyf û mixabin dema roja sisiyan hat û dîsanê hemû jinên li derdorê wê kombûyî dinava gotinên tûj û tal de ew birin û anîn, ne bicarekî lê bidehê caran. Wê demê ji acizbûna xwe nema digirt ji ber wê yekê ji nişkîve çavên xwe girtin û devê xwe ji wanre vekir û tişta ku wê gavê hatî ber devê wê ji wanre got.

Lê dema ku keça padîşah çavên xwe ji serhev vekirin delalê li ber dilê xwe roniya çavên xwe li tudeverî nedît ne biçavekî lê bi çar çavan lê geriya û negeriya lê, li tu cihî û tu deverî ew nedît. Te digot qey erd qelişiye û ew ketiye hindirê wê de, te digot qey bû kevok û firiya, tu bêjin û dengê wî ji tu deverî nehate dîtin û bihîstin.

Wê demê keça padîşah
şaşomaşo dima û nedizanî wê çibike û çinake, bigrî an li xwe bixwe an cilûbergên xwe biqetîne û bi çolûçolistann bikeve , lê feydenake tişta ku cêbû cêbû êdî gazind û loman tu pere pê ve nayê. Keça padîşah bi çavên tijî rondik û bi dilekî şikestî berê xwe da malê, bi tîrên êş û azarên ku hundirê wê dişewitandin weke agirê dojehê.

Keça padîşah bûyera ku bêre qewimî ji tukesî re behsê nekir, heyanî dayîka Fatê jî hayê wê ji vê meselê nebû û nedizanî ka kurê wê bikûve windabûye. Ji ber vê yekê kete nava liv û tevgerê û Derek nema ku têde li kurê xwe negera; lê nebêjnek ne jî xeberek jê wernegirt. Piştî ku dayîka Fatê vegeriya malê bi dilekî şikestî û rondik ji çavên wê dihatin xwarê, wê demê agirê bidilê keçapadîşah diket û agirê bi dil û cîgira dayîka Fatê ketî hrvdû temam dikir.

Piştî wê rojê û şûnde qet xwerin û vexwarin bi devê keça padîşah neket û tim bi tena xwe di oda xwe de li ser rewşa xwe dipûnijî û dinava kul û derdande dişewitî û dikesidî. Keça padîşah biryara xwe da ku bikeve ser rê û here li delalê li ber dilê xwe bigere û heyanî ku ew wî nebîne an saloxekî

Ezê weke ku neha tu min li ber çavên xwe dibîne bimînim û emê bihev re jiyanekî xweş û serfiraz derbasbikin.
Lê ger te, tişta ku neha ez ji tere dibêjim bicî neanî wê gavê, pîra sehar wê min ji ber çavê mirovan winda bike û min bi xwe re bibe dinyayeke din, ku tu kes nikaribe xwe bighîne wêdeverê û êdî ez û te dixewnan de jî hevdû nabînin. Piştî ku keça padîşah soz û ehda xwe da Qoqo, ku tişta ku ew jêre bibêje wê hemûyan yek bi yek bi cih bîne, wê demê Qoqo dest bi vegotina xwe jê re kir. Rojek ji rojan tuyê dinava komek keç û jin de rûniştîbê, wê demê ezê li ser pişta hespekî rewan kabşîn bikevim pêşbaziyê. Wê gavê hemû jinên li derdorê te wê ji tere bibêjin xwelîserê pepûkê çime te rabû qoqek kir
Ma qey hiş di serê tede nemabû, ma tu dînbûbûyî
Çavên te tarî bûbûn; manebaştirbû ku tu ciwanekî weke wî siwarî hana bikê, lê nebê ku tu hişê xwe ji ber vangotinan winda bikê û tu ji wanre yarast û dirist bibêjî ku zelamê min ne qoqeke zilamê min ev siwarê ku li ber çavê we dixwyênê û yê hûn behsê dikin ewe.

Rojeke dinjî ezê li ser hespekî kimêt werim û cilûbergê min wê pir xweşikbin ku herkes li bejin û bala min timaşebikê wê necarekî sed carî bihesidin xweşikbûn û lihevhatina min û cilên li min; dîse hemû jinên li derdorî te rûniştîn, wê vê carê duqatî cara derbasbûyî û tûntir ji tere bibêjin sed xwelî li serê tebê pebûkê rebenê hejarê çime te qoqek kir û te xortekî weke wî xortê ha yê ciwan nekir, ma qey zilam didinyayê de nemabûn heya ku tu wî bikî.

Careke din û cara dawiyê ezê werim û hespekî bozê dibin min de be û dîse hemû jinên li dora te kombûne wê bêjne te û bê navber sed xwelî li serê tebê ma çime te qoqek kir û te ev ciwanê ha yê bejin zirav û delal nekir siwarê hespê boz yê ku herkes diheside bejin û bala wî.

Wê gavê dema ku te hersê caran jî sebir û tehemula xwe nîşanda û tu mayî li ser soz û ehda ku te ji min re vê gavê dayî, wê çaxê ezê wek neha ku tu min dibînê bimînim û emê



ferqnîne, yê xizmetkar dibêjê na wele nabê. Wê demê S. Zibêde cilê xwe hemûyan ji xwe dike û şift tazî weke masiyekî derkeve ser avê xwe ji bo xizmetkar emedekir. Wê gavê H.Eldeşîd ji piştkevir derket ûgazî kir ha S. Zibêda eslê jinê jine an ji male mezine. Wê gave S. Zibêde li ber xwe dikevê û ji nûve dixwazê xwe veşêrê. H .Elreşîd jêre got: Çime tu xwe diveşêrê, ma ne te digot eslê jinê ji male mezine, mane ve tijî ji malekî mezinbûyî, lê meyzê te xwe gihande çi astê, wêgavê S. Zibêde dibêjê xeberêteye eslê jinê jine, lê nejmalê mezine. Weheye ku jineke xizan dicihê tedebane û xwe nekiribane vî halîde. Du hesp di axwirê de hebûn yek jê birçîbû û yek jê tîbû H. Elreşîd rabû bi wî halê ku ew têde lingekê wê bihespê tîve girêda û lingekê wê bihwspê birçîve girêda. Xwarin danî li ber yê tî û av didanî li ber yê birçî heçî hespê tiye xwe dikşande avê û hespê birçî xwe dikşande xwarinê û bivî awayî S. Zibêde kirin du parçe.

## GIYA NAMÎNE BIN KEVIRANDE

Rojek ji rojan zilamek, pevjîna xwe û keçeka wan tenê hebû; lê pevjîna wî nexweş ket, kete taya mirinê û çû ser dilovaniya xwe. Ji ber ku zilam bir ji pîreka xwe hesdikir ji xwere ehd û sozda ku nezewicê heyanî ku cilê pîreka wî nerizin. Ji ber vê sedemê piştî ku pîreka wî zehabû û çavên wê çûne ji vê jiyanê çûne ava, zilamê wê rabû cilê wê hemû kirin nava çiwalekî de û birin cihekî asê hilanîn.

Biştî demek li ser mirina pevjîna wîre derbasbû keça wî ji wîre got: Ez gelek caran nelimalim û kes nîne lit e meyzênê, ji ber vê yekê ez dibêjim ku tu ji xwere jinekî bînê wê baştir bê. Lê bavê keçikê bersiveke tûnd da keça xwe û jêre got: Min ji tere gotiye min soz û qesem daye xwe ku heyanî cilê dayka te nerizin ez nazewicim.

Keçik dimînê heyîrî, wê çawebikê heyanî ku bavê xwe qayl bike ji bo ku jinekî ji xwere bînê û barê wê henekî sivikbkê. Ji ber vê yekê, cîraneka wan yeke jinobî hebû, keçikê berê xwe da cem wê û ji wêre hal û meseleya bavê xwe vegot.

Cîrana wan ji ber ku dilê wê hebû ku bibavê wê re bizewicê lewma, jêre got: Here cilê dayîka xwe bîne û hemûkan bide ber keviran, wê demê dema ku bavê te wan bibînê wê bêjê qey rizîbûne û wê ji xwere jineke din bînê. Keçik biya cîtrana xwe ya jinobî dikê û radibê cilê dayka xwe dide li ber keviran û dîse dizivirîne cihê wê.

Dema ku bavê wê dizivirê malê ji bavê xwere dibêjê, neha cilê dayka min riziyane. Deka em li wan myzênin neha



Piştî demekî Qoqo hate ser hişê xwe û ji dayîka xwe re got: Te ev horî ji kîjan buhiştê revandiye. Di despêkêde Qoqo xwest ku silavê bide keça padîşah, lê dema ku destê wê kete nava destê wî de weke xwîneke germ tevzînokên bi tem û xweş bê navber êrîşî canê wî dikirin, wê çaxê dilê wî nedixwest ku destê xwe ji destê wê dûrbike ji kêf û şadiyan.

Welhasil herdû bihevdû şadbûn. Qoqo ne bi dilekî bi sed dilan dil kete keça padîşah û te digot qey herdû ji hevre çêbûne. Xweşikbûn, delalî û têgihiştina keça paşê ji milekî ve û ciwanî, lihevhatina kurê Fatê û mêrantiya wê ji milekî dinve. Herdûyan hevdû temamdikirin. Te digot qey sêveke te kiriye du parçe.

Çend roj li ser pevjîniya wan bi hevre derbasdibû. Tu gengeşe û kiryarin nedirêde dinavbera wan de rûnedan, evjî bûbû sedemê kêf û şahiya bav û dayîka Fatê ya ku destê wê ji roja ku keça padîşah aniye û heyanî vê rojê ji tirs û xofan li ser dilê wêye. Jiyana herdûyan ne tenê weke jin û mêrekî derbasdibû; lê belê weke du dost û hevalên dil soz weke du kevokan bihev re dinava baxçeyê azadiyêde dijîn û li ezmanekî bê sînor li ber perê ezmanan dibine yek deng,reng û yek can weke çirayekî ku sehwa tariyê dimiçiqîne li ser dara hêviyên hemû evîndarên ku merema wan li ser rûyê vê dinyayê negihiştiye encama xwe.

Em vegerin herdû kevokên xwe yê ku li ezmanê dilan difrin, Qoqo û keça padîşah.

Rojek ji rojan dema ku herkes ketibû xewê Qoqo û pevjîna xwe tenê bihevre mabûne şiyar. Qoqo ji pevjîna xwe re digot:

Piştî ku te bawerî da min û min jî ji te heskir û dilê xwe da te lewma dem hetiye ku ez ji tere tiştekî nepenî ku hîn min ji tu kesîre negotiye bibêjim.

Lê ji berî ku ez dest bi vegotinên xwe ji tere bikim pêwîste ku tu birengekî baş û bibaldarî li gotin û qisê min guhdarî bikê û tişta ku ez ji tere dibêjim, yek bi yek hemûyan bicî bînê wê demê

Ji gotinên kaça biçûk dayka Fatê gelek kêvxweş û şad dibû; lewma ji bo ku dereng nekevin û li wan nebe tarî herdû bi hevre derbasî meqama padîşah bûn. keça biçûk biryara ku dayî ji bavê xwe re bi xwîn sarî û devliken ragihand.

Padîşah ji biryara keça wî dayî matmayî dima lê carekî ehid û qesem daye xwe ku her biryara ku ew bi xwe bidin ewê bipejirîne.

Herdû xwîşkê wê jî gelek şaşomaşo mebûn ji biryara ku xwîşka wan ya biçûk dayî

lewma xwestin li dora wê herin û werin ji bo ku wê ji rê derxin û ji biryara ku dayî poşmanbibe û jê vegere. Lê çiqas kirin û nekirin xwîşka wan ya biçûk ji biryara ku dayî nahate xwar û bersiva wê ji wanre ev bû: Her mirovekî rûbeleke ji pirtûka vê jiyanê ye û jiyan ji bo her mirovekî wateyekî eîfede dike.

Lewma çavdêriya min ji vê jiyanê re cûdaye û ya we jî codaye û her mirovekî azade di jiyana xwede, ji ber ku didawiya dawiyêde ewê encamê biryara ku girtî û dayî bigrt ser milê xwe.

Bi vî awayî dayîka Fatê bûka xwe xemiland û cihêzê wê li gorî ku padîşah jêre sozdabû jêre amedekir û bibarê deh qantiran ew gehandin ber derê mala dayîka Fatê.

Dema ku bûka delal û dayka Fatê dane derî û derbasî hundirê odê bûn. Ji nişkîve çavê Qoqo bi xweşikbûn û delaliya wê ket ji ser hişê xwe çû û kete erdê; lê piştî ku dayîka Fatê henek av biser sere wî de kir

Pêre pêre çavên xwe ji hev vekirin, lê çidît û nedît vaye rojek li ser serê wî hilatiye û ji şewqa wê nikare çavên xwe ji ser hev rake.

Çavên fincanî weke heyvê roniya wan diçirise di sere birhên qeytanî weke kevala hîlala zêrîn, rûyekî zêrîn weke keskesora gerdena buharê radipêçe, du rêzên diranan di ber hev re dirêjbûne ji mircan û sedefên deryayî, zilif û biskên hevrişmî weke çemê Dîcle û Firat diherikin ser gerdena gewez. Bejin û bala zirav û dirêj weke rîhanê dimilmile, tu dibêjê qey te li gurî dilê xwe bi pênûsê xêzkiriye.



riziyane, na keça min hêzûye, li gorî ez dizanim demek dirêj divê heyanê ku cil kevin bibin û birizin; pavê gewr vê carê nexwest dilê keça xwe bihêlê, lê dema ku cilê jinika xwe ji nava buxçikê deranîn û destê xwe avête wan dinava destê wîde dengê çire çirê jêhat û bûne parçê biçûk.

Wê demê bav ji keça xwere dibêjê bikeyfa teye. Ma henek li dor te hene?

Piştî ku keçik henekî hizirî ji babê xwere got:Erê cîraneke me yeke jinobî heye pir bzşe, wê ji xwere bîne. Piştî ku demek derbasdibe li ser zewaca bavê wêre, hêdî hêdî rastiya jinbava wê xweyadikê û keçik ferqdikê ku ji wê hesnakê. Lê keçik ji milê xwe ve gelek jê hesdikê weke dayîka xwe û hercar jêre dibêjê dayê. Rojek ji rojan jinbava wê şûşek ava cemidî weke bûz lê cîlîkekî maran yê biçûk têxê navde û didê kaçikê û qedehek ava din didê keça xwe. Jinbaba wê naxwaze ku keçik bizanibe ku ew hej wê nakê. Roj bi rojê zkê keçikê diwerimê û jinikjî diber guhê zilamê xwere her gav û wext dike piste pist û jêre dibêjê, vê keça te em dinava xelek û alemêde hetikandine û alem li ser her roj diaxivin û gotinan dinava xwe de dibin û tînin. Çiqa ku bavê keçikê ji keça xwe bi ewleye lê maye heyîrî ji ber gotinên xelk û alemê, jina wî jêre dibêjê, gelek tu keça xwe bikujê. Lê bavê keçikê dibêjê dinya xerabê ez nikarim tiştekî wilo bikim, ma ezê çawe keça xwe û kezeba xwe bikujim. Ji ber vê yekê jina wî jêre dibêjê ger ku tu nikarê bikujê, wê ji nava malê derxîne û bibe ihekî dûr ji bo ku rûyê me dinava xelk û alemêde sibîbê û em bikaribin serê xwe dinava gnnde bilind bikin.

Deme ku dibê şefeq zilam keça xwe digrê û dûrikê xwe yê ku jina wî ji xweve ji wanre têde henek pêxwarin û av kiriye têde. Biştî demekî bav û keça xwe diwestin û li cihekî bêna xwe divedin ji bo ku gezek nan henek av vexwin, lê dema ku derê tûrikê xwe vedikin, çibibînin û nebînin vaya bêbavê keça kerê ji wanre ji dila nan tere ji wanre dagirtine û ji dêla avê ji wanre bîsîtiya ajalan ji wanre tijîkiriye. Ji ber ku herdû jinêza û tîne bimrin û ji wan herdûyan jî xilasbê. Demekî

şavêye bav û keça xwe ketine xewê, hêdîka bavê keçikê ji xewdirabê û kopalê xwe li ber serê keça xwe diçikilînê û gelek deha ji yezdanê qedirgiran dikê ku kopalê wî weke mirovekî li ber serê keça wî bizimanbê û her gavekî dema ku keçik bixwazê çavê xwe ji xewê vekê jêre bibêjê raze keça min raze ez bavê teme li ber serê teme û bivî awayî ji qodreta yezdanre kopal her gav dema ku keçik dixwazê ji xwe şiyarbê jêre dibêjê raze keça min ez bavê teme li ber serê teme, heyanî li keçikê dibe roj û çavê xwe ji xewê vedikê dibînê vaye bavê wê nîne li ber serê wê û vaye kopalê xwe li ber serê wê çikilandî hiştiye, wê gavê dilê xwe bi xwe dişewitîne û dibêjê: Erê yabo tejî dev ji min qeriya. Guniha xwedê ji tî û birçîna laşê wê li wê bûye bela, dikeve li ser rê û dimeşe heyanî ku dighêje cem kaniyeke avekî zekal. Dihindirêkaniyê de marek heye û bi marê dizikê keçikêre dikava nava axaftinan û jêre dibêjê: Wa maro tu çiwî û te xwe li wê keçikê kiriye bela ka were derkave ji xwere li xweşikbûna dinyayê meyzêne vê ava xweş û zelal nava van bexçe û darên xweş. Lê marê dizikê keçikêde ji yê dinava kaniyêre dibêjê cihêmin gelek xweşe her gav ez xwarina hazir dixwim û tiştek ji min kêmnabê û cihê min gelek germ û nerme. Piştî demekî mrê dihindirê kaniyêde marê dizikê keçikêde qayl dikê. Lê ji wîre dibêjê ez nizanim çawe ji vêdê derkavim. Mare nava kaniyê jêre dibêjê tenê tu henekî xwe tevde wê demê wê dilê keçikê bixele û wê te bavêjê derve. Dema ku keçik dilê wê dixelê û carek ducaran erq têne wê serê ma henekî dedikevê ji derve û bayê sar lêdidê heçî mare ji biçûkayîve serma nedîtiye ji ber wê yekê dixwazê careke din şûnde bizivirê, wê demê keçik bi destê xwe serê wî digrê û ji kel wî ji zikê xwe dikşînê derve û wî tavêjê nava avê û zikê keçikê dizivirê mina berê. Mane keçik stara yezdanê mezin li ser bê hingî bi hisin û cemale ji xweşikbûna wê weke şewqa rojê çavê mirov jê dişkê. Piştî ku keçik rûyê xwe dişû û henek ava kaniyê ya cemidî vedixwe û bêna xwe dide li ser dara li raserî kaniyê dirûnê. Di wê gavêde kurê muxtarê gundekî ji wan gundê nîzîkî deverê bihespê xwe re



Xwîşka piçûk ji her milê xwe ve ji xwîşkên xwe yê din cûdatirbû te digot qey eve horiyeke ji ezmana daketiye ser rûyê erdê, xwedî bîr û bîreweriyeke hemdeme, mal û milkê dinê nekariye bandora xwe li ser hişmendî û remanê wê bike, xwedî rihekî nazik,sivik û bê sînor bi xweşikbûn û dîdariyê hatiye xemilandin.
Ji ber van taybetmindiyên xwe yên giran biha, dayka Fatê heme dihindirê xwe de bersiva wê fêrdibû bê ku ji devê wê bibhîze û ji xwe re digot eve keça ku ez bisalan lê digerim û enceq ev layîqê kurê min bibe û li gorî dilê wî be.

Piştî ku dayka Fatê mebesta xwe ji keça padîşah ya biçûk re vegot dinava bêdengiyê de heyanî demekî ma li benda bersiva keça padîşah. Zêde neajot û keça biçûk dest bi axaftina xwe kir bi peyvên weke şîr û şerbeta buhiştê yê ku mirov ji guhdarkirina wan tucaran têrnabe. Deyka Fatê weke ku tu jî dizane ev jiyan bi mirovan avadibe û bi wan jî xeradibe û mirov bi dilnimzî, merdî, dilpakî û bîreweriya xwe tê heskirin û cihekî xwe di dilê her mirovekî de digre. Ji ber vê yekê weke ku pêşiyên me gotiye"aqil taca zêrîne." û mirovê cahil jiyan li bêşiya çavên wî tarî dibe û tenê têde xwe dibîne û xwe diecibîne.
Ji ber vê yekê xizanî ewe xizaniya aqil û bîreweriy ye.
Lewma tişta ku ez ji vê dinyayê dixwazim ewe: Ku du dil birastî û diristî bibin yek û ji hevdû hesbikin mesele nîne bile dimala wande nan nebe jî ya giring ewe ku dirih yekbin û di xweşî û nexweşî de li gel hevbin, wê demê tu hêz û qwet di cîhanê de nkare wan ji hev dûrbêxe û weke ku pêşiyên me dibêjin "dirav gemara destine diçin û tên"
Lê mirovê bê romet û namûsbe nikare bi pera romet û namûsê bikre. Ji ber vê yekê ez hazir û amedeme ku bi kurê te Qoqo re pevjîn bikim.
Ji ber weke ku min ji tere vegotina xwe vehûnandî tişta ku ez dixwazim û li vê dinyayê lê digerim dilekî ji min hesbike û bi minre bikeve keştiya evînê û heyanî mirinê bi minre rast û dirist bimeşe.

Naxwazim sere we gêjbikim û  ji we re dûvdirêjbikim.
bersiva keça navîn jî heme heme weke ya keça mezin bû te digot qey herdûkan ji yek fincanê zehferan û qetran vexwarine, ji ber ku hizrandina wan û hişmendiya wan eînî weke ya hev bû. Ji ber vê yekê qet dayka Fatê zêde axaftina xwe nedomand û ji hindirê oda keça padîşah ya navîn bi yek carî bi dilekî şikestî û bê hêvî derkete salona qesrê.

Dayîka Fatê hindik mabû ku hêviyên xwe ji mebesta ku pêve hatî bi yek carî qotbike, lê dîse dengê kurê wê dihate ber guhê wê û dil û hinavên wê dihelandin.

Yek derî li bêşiya wê mabû lê nedizanî çime hêviyên wê ji nşkîve bilindibûn û ji nava deriyê sisiyan weke şewqekî û tîneke gerim xwe tavête dilê wê; lewma hemû coş û hêviya xwe komî ser hevkir û bidevkenî li derî xist.

Ji hindirê odê dengekî nazik û zîz dihat gelek ew kêfxweş dikir. Li ser destûra keça piçûk derbasî hundirê odêbû lê çidît û nedît sankî heyveke çardeşeviye li nava mêrk û kaniyên ezmana bi şewq û roniya xwe gerdûn,xweza û mirovan hembêzdike. Ez ji were çibêjim û nebêjim başe ez na xortekbûn nexwe minê xwe winda kiriba û biyek carî dilê minê ji ber hisin û cemala wê, dicihê de rawestiyabe.

Dema ku min silav lê kir bi gotiên weke şîr û şerbetê silava min veda û ez bi hemû germahiya dinava dilê xwe de hembêzkirim.

Ji ber vê yekê ez di hizûra wê de gelek biste û serbestbûm, te digot qey ev bisalane em bihevre dijîn.

Piştî demeke dirêj ji yarî û henekên me bihevre derbasdikirin yê ku me nedexwest qet bi dawî bibin. Piştî ku me weke du zarokên ku tu bandora mal û milkê dinê ew gemar nekirine têra xwe henek û yare kirin, min mebesta hatina xwe jêre vegot û bersiva ku herdû xwişkê wê ji min re dayê min jêre ragihand. Piştî demekî  dinava fikar û hizrandinande, baş xwya dikir ku ji bersivên herdû xwîşkê xwe yê ku dayîn dayîka Fatê gelek bê êşiyaye û gelek li ber xwe ketiye ji bo van gotinên nedirêde yê ku hatî gotin.



tê li ser kaniyê û dema ku hespê wî dixwazê avê ji kaniyê vexwînê şewqa keçikê didê kaniyê lewma hespê kurê muxtar her gav ji avê serê xwe dûr dikê û avê navexwê. Çiqa kurik çavê xwe li hawîrdorê xwe digerînê û nagerîne lê kesî nabînê ji nişkîve bêjnekî ji nava dare dikê radibê berê çeka xwe didê darê û bidengekî bilind dibêjê derkeve yan ezê te bikujim carek du car keçik ji tirsa canê xwe ji nava dare derdikeve. Wexta ku keçik ji nava dare derdikave kurê axa ne bidilekî bi sed dilî dikeve keçikê. Krçik ji kurê axêre mesela xwe hemûyî ji serî heyanî binî hemûyî jêre dibêjê. Kurê axê ji keçikêre dibêjê tuyê qîma xwe bimin bînê an na, keçika perîşan bê kes û xwedî maye û li ezmana yekî digerê ku lê bibê xwedî lewma daxwaza wî dipejirînê. Kurê paşa ji keçikêre dibêjê li vêderê bisekne heyanî ez bav û dya xwe bînin ji bo ku em te bi xwere bibin, ez ji bilî te bikesîre pevjîn nakim. Di wê dama ki kurê paşê dighêjê malê û ji ehlê xwere pesnê çeleng bûn û bedewbûna keçikê didê, sêkesê qereçî têne ser kaniyê ji bo ku firaxmraxê xwe bişûn, lêdema ku şewqa keçikê li ser rûyê kaniyê dibînin, her yekî ji wan ji ya dinre dibêjê ev şewqa ha ya mine û ya xweşikbûna mine û bivî awayî hersê li wir şerê hev dikin lê dema ku keçik hisa wan dikê ji wanre dibêjê ew şewq ya mine ne ya yakî ji we hersêkane. Keçik ji wanre mesela xwe bi dilekî safî û paqij dibêjê, zikreşî û çavnebarî dinava hersê keçikan de derdikeve ji ber ku kurê paşê wê keçikê ji xwere bibê û yekî ji wan nabê, radibin hersê lê kom dibin, cilê wê jêdikin û yek ji wan jilê wê li xwe dikê û wê tavêjin ber kaniyê. Ji qudreta dinyayêre keçik li dora kaniyê dibê take rîhanê. Kurê paşa bavê xwe û xizmê xwe qayl dikê û berê xwe dane ser kaniyê. Wê demê erf û adet ûsabûn ku zava û bûkê hevdûnedidîtin hryanî şeva dawetê dema ku zava desbasî cem pevjîna xwe bû û serûk ji ser çavê wê da alîkî. Wê çaxê ferqkir ku keçik ne ew keçika ku li ser kaniyê bi çavan dîtiye. Kurê paşê jê pirsî û gotiyî: Dema ku min tu dîtî tu nebivî awayî bûyî, çime wilê li te  hatiye. Keçikê got: Qet behsê neke ji eşqa û kêfa rûyê min û lêvên min hemû bûne

şeq û terikîne û hingî min ji kêfa xwe li ser kevirê kaniyê dihilkuta ji ber wê yekê lingê min hemû reşbûn û terikî û hingî ez ji eşqa digriyam û dikenîm çavên min ji vê yekê sorbûn. Kurê hakimê feqîr wê çibêjê ji keçikê bawerkir. Roja din pevjîna kurê hakim dibêjê min ew taya rîhana li dora kaniyê dive ku tu ji minre bînê. Keçik naxwazê ku hîla ku wê li kurê paşa kirî kifiş bibê lewma dixwazê taya rîhanê qutbikê. Çiqa ku kurê paşê jêre dibêjê ew taya rîhana ku li wir şîn hatî bihenke xweş li derdorê kaniyê dilê û dema ku mirov her gav diçê li dora kaniyê bihna wê li mirov didê çiqa xweşe. Ma çi nerehetiya te ji wê taya rîhanê heye. Keçik dibêjê dilê min ketiyê û ez dixwazim ku tu wê ji minre bînê. Dema ku tayê rîhanê dighêje destê pevjîna kurê paşê wê dikê piçû piç ji bo ku hêdî şîn newê, lê ji qudreta dinyayê ew tayê rîhanê dibê kevok û difrê û diçê li gova ku meha wa ya kor têde girêdayîye û bêşmiqabilê wê di kulekê de bicihdibê, lê gingî ku ew kevok xweşike meha kor hertim lê meyzedikê û xwarina xwe naxwê. Jinika qereçî ji ber ku ditirsê ku meseleya wê eyan bê dibêjin vê kevokê bikujin ji ber ku nahêlê meha me êmê xwe bixwê. Jêre dibêjin ji xwe meha me kore û çepele ji ber wê yekê êmê xwe naxwe. Virde wirde ji mecbûrî kevokê tînin û wê li kêleka hewşê serjêdikin, wê demê xwîna kevokê û rihê keçikê dikevê hindirê axê û dareke hinaran di dewsa wê de şîntê û bilindibê. Sal derbas bûn û dara hinarê mezin bû û xweşik bû û di wê navberê de xwidê kurek da keça qereçî, rabû ji kurê paşêre got: Ez dixwazim ku hûn ji vê dara hinarê dergûşekî ji kurê minre çêbikin. Jêre hingî gotin mane dergûşê hazir û xweş li sûkê xwirîne û bi çirengî te divên hene; lê keçika qereçî got: Erd bigihê ezman ji bilî vê dare min navê. Lê jêre gotin: Yaho te got tayê rîhanê me ji tere anî te got kevok me ji tere gorand, vêce neha ev çiye te bela xwe firotiye vê darê de bela xwe jê veke. Lê jinikê got ne evbê min navê.
Rabûn ji neçarî biya wê kirin û gazî biredar kirin, dema ku biredar dest bi birîna dare kir, ji nişkîve dengekî nizim hat û ji darbire got: Hêdî hêdî te milê min birî, lê yê biredar çiqa li



Dema ku li deryê keça mezin xist û destûr ji wê wergirt,derbasî hindirê odê bû lê ji pêşwaziya wê ya sar,xaf,rijî û bê dil heme di cihde tê gihişt ku mebesta wê li cem vê keçê pêknayê. Keça pedîşa ya mezin gelekî poz bilindbû û tim dixwest ku biyekî maldar û weke xwe re pevjîn bike. Ji ber vê yekê dema ku dayka Fatê mebesta xwe jêre vehûnand.
Bersiva keça mezin bê ku bihizire hazir û amedebû û bi yek carî te digot qey guriya agire ji devê wê dipijiqe berê xwe da dayka Fatê, çavê xwe girt û devê xwe vekir û jê re got: Pêwîste ji berî ku tu biaxivî tu bizanibe ku tu li kuderê rûniştiyî û bi kî re diaxivî, meqama xwe û ya wan baş nasbikî. Hîn dayka Fatê ji şoqa gotinên wê bi ser xwe ve nehatibû, hemen lê vegerand û li ser gotinên xwe temamkir û got:
Maqey ez dînim heyanî ez kurê teyê qoq û yê ku firingek tenêjî dibirîka wîdenîne re pevjîn bikim. Pêwîste ku tu bizanibê ku xortek tenêjî di vê dinyayê de nemîne û kurê te yê dawiyê be jî ezê xwe bikujim û ez pêre pevjîn nakim.
Piştî ku daykê ev gotinên tehil û zirav weke jehrê ji nava dojeha devê keça padîşah ya mezin bihîstin, heme biyek ser ji hundirê oda wê derket bê ku xatir jê bixwaze. Ji ber ku odeyên hersê keçê padîşah li rex hev rêzdibûn heme dizanî ku oda direx oda keça mezin de odeya keça navîne.
Li ber deriyê oda kaça navîn dayka Fatê xwest ku dev ji mebesta hatina xwe berde û vegere mala xwe û hew xwe bihetikîne û gotinên nedirêde ji devê mirovên ne wek mirovan bixwe û vexwe. Lê dema ku kurê wê yê li benda hatina wê li ser agir disekine û çavên wî li hatina wêne, wê demê agir bi kezeba wê diket, cerg û hinavê wê diheliyan û dirjiyan. Lewma biryara xwe da û ji xwe re got heyanî mirinê jî ezê her tiştî tehemul bikim tenê ji bo miradê kurê xwe yê dilovan bi cih bînim.
Piştî çend deha û selewatan ji yezdanê mizin re, li deriyê keça navîn xist. Piştî ku destûr xwest derbasî hundirê oda wê bû.

sifra xwarina ku têde ji her çeşîtê xwarinê peydadibin dirûnim, ji ber vê yekê her tiştê ku dihindirê qesrê de heyî ji xwarinê û vexwarinê bigre heyanî xemil û xêla qesrê û kesên dihundirê qesrê de dijîn bi aleqeyekî mezin û bibaldarî min lê temaşe dikir.
Piştî ku me bi hev re xwarin xwar û çayê vexwar.
Em ketin dinava sihbetekî kûr û dirêjde, ji ber ku min ew nasnedikirin lewma wan ewilî dest bi axaftinê kirin û gelek caran di nava axaftinên xwe de ji min pirsdikirin û min bersiva wan dida. Hêdî hêdî axaftinan hevdû dikşandin heyanî ku destarê axaftinan gihîşte mebesta hatina min û tişta ku bidestê wan tê û dikarin bicihbînin ji bo min.
Tişta ku herî bala min dikşand ew bû ku heryekî ji keçên padîşah biserê xwe di odeyekî de dima û her yekî ji wan xizmetkarê wê ji ya din cûdabû.
Piştî demeke kurt dinava bêdengiyêde, min dest bi mebesta hatina xwe ji wan re vegot û min ji wan re ta biderzîve kir.
Padîşah û pevjîna xwe herdû li kêleka hev rûniştîbûn; lê hersê keçên wan her yekî derbasî oda xwe bûbû.
Piştî min vegotina xwe qedand, padîşah û pevjîna xwe piştî ku di guhê hevde û bidengekî nebihîstî piste pist kirin.
Padîşah dest piaxaftinê kir û ji min re got:
Me li çîroka te guhdarî kir lê biryara pevjîna keçên min ne didestê min de ye. Ji ber ku min soz û ehid daye xwe û wan ku heryekî ji wan biryara pevjîna wê didestê wêdeye bi kîre pevjîn dike an nake min şol pê nîne eve tu û eve hersê keçên min dema ku qayîbûn bi kurê tere pevjîn bikin ez tu caran nabim manihê vê tiştê. Ger ku qebûl kirin ezê xwe bi destê xwe wan cihêzbikim û tişta ku pêdiviyên wan pê hewceye jî ezê ji wan re hazir û amedebikim ji ta û derzî bigre heyanî tiştê din.
Dema dayîka Fatê ji devê padîşah ev vegotin bihîst gelek pê kêfxweş bû û hêviya wê hîn bêtir weke çirayekî geştirdibû.
Dayîka dilovan yeko yeko destûra derbasbûna cem keçên padîşah ji bav û dayîka wan girt û xwest ji keça mezin despêbike.



dora xwe meyzan lê tukes nedît, carek ducaran dîse deng ji dare derket, biredar ji wanre got: Ez vê darê jênakim ez hîsdikim ku ev dar dipeyve. Lê jêre gotin: Ma qey tu dîn bû çawe da diştexile, lewma ew birin û yekî dî anîn; lê wîjî eynî weke yê dî got ku dar diştexilê û wîjî ji wanre got: Ez vê darê nabînim, rabûn çûn yekî henekî ker qnîn ji bo ku deng nebihîzê lê hingî dengê keçikê nazik û xweşzaravbû zilam çiqa guhê wî nedibihîst lê dîsa dengê keçikê hiskir û wîjî dev ji darê berda. Rabûn çûn biredarekî yekcar ker anîn, rabû dar birî û kire derguşjî lê qet hisa keçikê nekir. Bişev û roj kurê wê digriya û xew nediket çavê wî jinikê dizanî ku kecik nahêlê ku kurê wê raze, ji bre vê yekê dibêjê vê dergûşê bişewitînin. Kurê hakim ji wêrw gor: Kurê te ji xwe harhareye û xewa wî nayê mesele nedergûşe. Lê dîse hedara jinika qereçî nehat heyanî ku dergûşê dişewitînin, lê dema ku dergûşê dişewitînin qetek parçek dar ji agir difilitê û naşewitê, keçik deha dike ku hemû rihê wê di wê parka darde kombibê. Diwê navberê de pîrek tê mala wan û ji wan tiştekî dixwazê heye ku qetek darbê jî wê pê qayîle digerê û naqerê tenê wî qetê dar dibînê û wî ji xwere dibê male. Pîra ku ew parçê dar ji xwere birî neşev û neroj li malê nasekne heroj li malekiye lê dema ku jinika pîr ji malê derdikevê keçik ji hindirê dare derdikevê û xaniyê wê hemû paqijdikê û hemûyî lewdidê û xwarina wê jêre diristdikê. Jinika pîr ji rewşa mala xwe matmayî dimînê, lê nizanê kî mala wê paqij dikê. Rojek duroj, heyanî ku rojek tê û pîrê ji xwere dibêjê ci bibê nebê pêwîste ez bizanibim ka ev kiye li pey min tê û mala min hemû paqijdikê. Ji ber wê yekê xwe li pişt derî diveşêrê û naçê, ji nişkîve dibînê ku vaye keçik ji darê derdikevê û dest bipaqijkirina mala wê dike û dema ku dixwazê biçê pîrê xwe zerdikiyê û nahêlê ku biçê. Çiqa keçik dixwazê xwe jê xilasbikê û biçî, pîrê dibêjê heyanî ez salifa te fêrnebim ez nahêlim ku tu biçê. Kdçik ji pîrêre salifa xwe dibêjê. Pîrê piştî ku mesela wê jê fêrdibê ji keçikêre dibêjê, mane ez tikû tenême ji ber vê yekê tijî mîne li cem min hesêba tu keça minî û ezjî dayka te me. Keçikê jî

ev yek qebûl kir. Demsala zivistanê hat û dinya bû sir û seqeme ji ber vê yekê hakim ji ber ku devehê wan pirbûn nedikarîn wan xwedîbikin ji ber vê yekê devehê xwe li malan belav dikin heyanî buharê wê demê qelew û zexim bibê hakimê tenekek zêr bide wan. Keçik ji pîrêre dibêjê ezjî dixwazim devehekî xwedîkim pîrê dibêjê keça min em feqîrin û me derfet nîne ku em xwedîkin; lê keçik dibêjê na wele emjî devehekî xwedîkin. Ji ber ku keçik zehv dixwazê ewjî devehekî xwedî bikê pîrê dilê wê nahêlê û biya wê dike. Keçik gelek guh didê devehê û lê miqatedibê ji ber wê yekê deveh biser xweve tê û gelek zexim dibê.
Buhar tê xizmetkarê hakim û işedarê wî mal bi mal dest bikomkirina devehan dikin. Hemû devehan ji nava gund kom dikin tenê deveha mala pîrê dimînê. Ji xwere dibêjin çi deveh maye çi nemaye, dibêjin deveha mala pîrê maye. Dema ku birêde diçin ku deveha pîrê bînin ji xwere dibêjin vêga deveha pîrêjî neha weke pîrê lawazbûye. Keçik devehê şîret dikê û jêre dibêjê dema ku çiqa ji tere gotin rabe nerabe heyanî ez werim û ji tere bêjim rabe. Hişedarê hakim dikin û nakin deveh narabê ser xwe. Pîrê dibêjê heya ku keça min newê û ji devehêre nebêjê rabe nerabê, ji pîrêre dibêjin ka bake keça xwe bile zû werê. Pîrê dibêjê heyanê hûn berikê li pêşiya keça min nedeynin nayê. Hişedar tê û ji hakimre dibêjin hal û mesele eve, hakim dibêjê çi nabê berikê jêre dînin ma wê çibê. Ji devê malê heyanî cem devehê ji keçikêre berikê li erdê radêxin, wê gavê hakim xwejî li wir amedeye dema ku çavê hakim bi keçikê dikevê dicihde nasdikê. Hakim ji keçikê tişta ku hatî serê wê fêrdibê radibê ser xwe pîreka qereçî dikujê, Kurê hakim û keçik jî dighêjin hev. Çîroka min xweş kanî çînîk zebeş.



dibêjin ku rehma di dilê wî de, di dilê tu kesî de nîne.Li ser wî dibêjin û dibêjin hrw…
Ji ber bihîstina van saloxan, Ji nûve baxçê hêviyan di dilê dayîka Fatê de dibişkivî û têde govenda şadiyê digeriya.
Ji ber ku dayka Fatê dema ku ji malê birêketî soz û ehid dabû xwe ku heyanî ji kurê xwe re keçeke rind, delal û lihevhatî peydaneke, wêtucaran aramî û rehetî nekeve dilê wê û careke din lingê wê bi malê nakeve û li welatê ku tê de çavê xwe li dinyayê vekirine careke din nazivire û ji xwe re digot:
Ger ku qasî çirûskekî hêvî hebe, bile li dawiya dinyayê jî be, ezê misoger brû wê ronahiya heyî ve bihemû hêz û ûmîda xwe ve bê veger ezê bimeşim, mirî be an bi saxî be jî ezê xwe bighînime armenc û mebesta xwe.
Dema ku dayîka Fatê biryara xwe nûkir, kete ser rê lingo tu bi qurbana seriyo û berê xwe da qesirûqonxê padîşah. Weke ku ne yek kes sed kes jê re bibêjin ku merema te li cem vî padîşahî wê bicihbibe.
Çiqas ji rêveçûna dirêj û dijwar bêhal dixwiya û ji lingên wê xwîn diniqotî ji cihê şûna stirî û diriyên ku dilingê wê de çûbûne xwarê û jandidan. Deyîka Fato qet guhê xwe nedida tiştekî, tenê merema wê ew bû ku hêviya kurê xwe bi cî bîne û vegere cem kurê xwe yê ku ev bisalaye jê dûrketiye û ji ber bêrîkirina wî ya dijwar dil û cîgera wê dihele û dikizire.
Çiqas padîşah mirovekî maldarbû, sehû û tirsa wî didilê herkesîde çêbûbû; lê
Dibêjin dihindirê xwe de mirovekî dil nizim û pake û ji tişta ku bidestê wî tê qet tu caran texsîrnake. Pêşewazî û melavaniya wî ji bo mirovan ji milekîve û gotinên ku li ser dihatin gotin ji milekî din ve, ez dinava goman û matmayînêde dibirim û tanîm.
Piştî ku min henekî bêna xwe veda pevjîna padîşah ez vexwandim ser xwarinê û em bi hevre li dora sifra xwarinê kombûn.
Ji ber ku ev cara yekemîn bû ku ez derbasî cihekî wise dibim û di hizûra henek mirovên maldar û xwedî cah û esil li ser

sedeqeyan yezdanê mezin ji wanre ev kur verêkiriye heyanî ku bi yekcarî ji nava destê wan biçe.

Weke tîrêjin rojê yê ku erd û ezmanan hembêz dikirin, dayka Fatê jî weke hinaseyeke hînik û sivik xwe dighande gelek gund,bajar,çiya,zozan û welatan û carcaran nizanîbû bikûve diçe ji westandin û bêxewiya ku ew dinava pêlên xwe de dibir û tanî û bi diranên xwe dixwest ku reman û xeyalên wê parçe parçe bike. Ji ber ku stirî û dirî û stiryan çol û çolistanan hemû vegirtibûn û dinava bedena xwe de cilûbergên dayîka Fatê peremparçe dikirin,

Heme heme pêlava dilingê wêde jî ji ber rêveçûna dinava xaçe rêkên xwaromaro û tijî kevir û zixuirên tûjomûjo yê weke parçên cîlêtan, pêlava di lingê wêde didane li ber gezan û ew kunkunî kiribûn.

Her roj li welatekî nû dibû mêvan, rûbirûyê kesnê nû dihat û ji wan re çîroka xwe vedigot û bihevre dibûne şirîkê derd û kulên jiyanê. Ji şivanan bigre heyanî gavanan û nêçîrvanan, ji cotyaran bigre heyanî rêwiyan tukes li ser rûyê wan welatê dorbedorê wan nema ku bi halûmeseleya wê nehesiya. Herkesê ku dema li derdê wê guhdarî dikir û li halûmalê wê temaşe dikir negengazbû ku dilê wan ji keser û hesretan parçeparçe nebe û herkesî dema ku têgihiştin ku mesela Qoqo Kurê wan çiye, nebi dilekî bi sed dilan dixwestin merema wî picihwe re.

Hêdî hêdî tevnê bêhêvîbûnê dixwest xwe li ser mebest û amaca dayîka dilsoz û dil bikeder vepêçe.

Lê didawiya dawiyê de saloxek gerim weke bayê buharê li ber guhê dayka Fatê diket, ew salox jî ewbû

ku dibêjin padîşahekî xwedî qesir, qonax, milik û mal heye û çiqas ev padîşah serdestê vî welatiye û gotina wî nabê didu, lê dibêjin ku ew mirovekî dil nizme û kesî ji devê deriyê xwe vale nazivirîne û dibêjin ku sê keçên wî hene û her yekî ji wan ji ya din xweşiktir û ciwanti re û dibêjin ku wî ehid û qesem ser xwe daye ku ew li pêşiya jiyana keçên xwe nabe engel û asteng û her yekî ji keçên wî dilê wê kî dixwaze pêre pevjîn bike an naxwaze ew serbest û azane û



## ŞÊR ŞÊRE ÇI JINE ÇI MÊRE

Hebû nebû, carekî ji caran eşîrek hebû û mezinê wê eşîrê gelekî bi hêz û quwet bû û pir ji xwe razîbû. Ji ber vê yekê xwest ku demekî ji eşîra xwe veqetê û dest vale nezivirê eşîrê. Zilam hingî zexim û bi hêz bû ji xwe xurtit kes nedidît, berê xwe da ser riya çûn û hatina xelik û alemê. Heçî diçû û dihat ew dişelandin yê bibarba barê wan ji wan digirt, yê xwedî diravba diravê wan ji wan digirtin û yê tiştek pêre nebane ew şift tazî dikir û ew berdida.

Rojek ji rojan dema ku li ser rê sekinî bû û li benda hatina xelk û alemêbû. Ji dûrve dît vaye ku siwarek tê û ji cilê wî xwiyaye ku mêrxaseke û xwedî esl û cahe. Heçî diber wîre derbasdibû bi rehetî ew bernedida, lê ji xwe re got: Ger ev zilam di ber minre derbasbû tenê silavek li min da ez tiştekî ji wî nakim û ezê bihêlim bile di riya xwede biçê. Lê dema ku zilamê gewr di berwîew derbas bû û silv lê neda, bi yekcar ji dînê xwe derket û gelek aciz bû. Mahingî ji xwe razîbû Ji xwe re got : Çawe ev zilam, ji min netirsa û diber min re derbasbû û silav neda min. Rabû heyanî ku yezdanê mezin hêz dayê bi zincîra ji hesin ya ku didestê xwede danî wî siwarî. Lê ji dînê xwe derket û matmayî ma çawe ku siwar qet li ser hespê xwe neliviya û weke ku tu li dîwarekî qalind bidê ji cihê xwe neleqitî. Zilamê siwar ji nişkîve li pişt xwe meyzand, rahişte werîsekî û avête noqa wî û heyanî jê hat hespê xwe lezand û ew bi erdêre xirikand. Di rêde yê

siwar ji xwere got: Du nan bi minre hen edema ku ez bighêjim cim avê ezê yekî ji wan bixwim û yê din ezê di avê de berdim, wê gavê zilamê bi hespêve girêdayî hingî tî û birçî bûbû ji xwe re got: Wele ezê ji nêza bimrim. Dema ku siwar gihişte avê rahişte nanekî û avête dawa zilamê girêdayî û nanê dîjî xwar. Wê gavê zilamê girêdayî matmayî ma û ji xwere got: Ev çi mirove vîqayî dirêde sûn û qesem dixwar ku du du nan pêre hene, wê yekî di avê de berdê û wê yê din bixwê. Lê vaye neha nanek da min, ya baş ewe ez nanê xwe bilez bixwim hêj nehatî bîra wî û nanê min ji dest min negirtî. Zilamê girêdayî piştî ku nanê xwe hemû xwar ji siwar pirsî yaho min tiştek ji te fêm nekir ev sehetek bû te dirêde sed sûn û qesem dan ku tu gazek nanjî nedê min, lê te nanek xwar û nanek da min. Min ji te fêmnekir kanî sozê te, di avêde çûn an…
Lê yê siwar jêre got _ nanê te xwarî min bi wî tu ji mirinê xilaskirî; lê nanê min xwarî weke ku ez wî di avêde berdim. Lê zilamê girêdaî têneqihişt ka mebesta yê siwar çibû. Siwarê hespê rabû zilamê girêdayî vekir û jêre got_tu niha azadî, bikûve dixwazî biçî biçe, heger tolbê min tola xwe ji te hilanî êdî bese.
Zilamê girêdayî pişta xwe da yê faris û karkir ku piçê. Didilê xwede ji xwere got: Vê ecêba dinyayê hîn li ser rûyê vê dinyayê ji min xurtirjî hene, wele az naçim û ezê bibim zilamê vî zilamî. Rabû dîsanê zivirî cem yê siwar û jêre got_ ea dixwazim bibim zilamê te û bitere bimînim, tişta ku ti ji min bixwazî ezê ji tere bicih bînim ji destê teyê çepê heyanî yê rastê ezê weke dilê te bixwazim bikim. Yê siwar got_ tu xwediyê gotinê xweyî? Zilamê din got_erê, lê yê siwar got: Sê şertê min hene ger tu wan pêkbînê ezê wê gavê meqseda te pêkbînim. Zilamê talancî jêre got_Şertê te cibin min pê qayîle, lê yê siwar got_Ka bise heyanî min ji tere şertê xwe gotî : Heme wilê ziwa ziwa nabê. Şertê yekê dema ku tu biminre bimeşê navê te netizilambê, ya din ji dêla ku tu mirovê xizan dişelênê were emê bihevre mirovê zengîn bişelênin û ya sisiyan ewe ku ez û te bihevrebin hete hetayê.



Lewma we çû jineke bi qasî dayka min ji min re veguhest û we xwest ku ez bi vê yekê qayîbibim û bê dengbibim.
Ma min didespêkê de ji were ngotibû pêwîste hûn keçeke ciwan, lihevhatî û li gorî diê min be ji minre bixwazin ji bo ku em bihevre dinava kêf û xweşiyê de bijîn. Mane hûn jî dizanin ku jiyan ne rojeke, ne du rojin
Heyanî ku mirov bi hevre bibûrîne û îdarebike.
Dayîka Fatê ji nûve têgihişt ku mebesta kurê wê çiye. Ji ber vê yekê  dayîka Fatê, piştî ku axîn û keserên tûj kişandin ji kurê xwe re soz û ehid da ku li her çar milê dinyayê bigere heyanî ku keçeke sipehî, lihevhatî û li gorî dilê wî jê re biguheze û heyanî ku vê soza xwe bi cih neyîne lingê wê bi vê malê nakeve.

Dengê dayîka Fatê diçû guhê Qoqo lewma, ji ber keser û axînên dayîka xwe, xwe negirt û rondik ji çavên wî hatin xwarê; lê dema ku dayka Fatê rondikên kurê xwe dîtin agir bi canê wê ket. Ji nişkave xwe negirt û biyekcarî ew xiste hembêza xwe û herdûkan bi hevre  dest bi kirî kirin. Dayka Fatê ji kurê xwe re vegotina xwe kir û jê re got: Tû qet xem, kul û mereqan nekşîne ez canê xwe jî bidim heyanî ku ez merem û hêviyên te bicih neynim ez li vê warî careke din nazivirim û baş bizanibe bile ez mirina xwe bibînim û careke din qet nebînim rondikek  tenêjî ji çavên te werin xwarê.
Bi hilatina rojêre dayka Fatê
Tûrikê xwe diristkir û henek nan, penîr,şekir û xwê têde bicih kir, turikê xwe da ser mile xwe, piştî ku xatir ji kurê xwe û zilamê xwe xwest, pişta xwe da oxirê û berê xwe da felekê.
Çend roj derbasbûn û deyika Fatê bi şev û roj dimeşiya bê ku bihin vedanekî jî bide rêveçûna xwe.
Çiqas ku dayka Fatê didilî di hindirê xwe de jiyan dikir û dinava gumanan de diçû û dihat ku kes keça xwe bide kurê wan yê Qoq û xizan, lê dîse jî ji bo ku gelek ji kurê xwe hesdikirin û nedixwest ku ew ji wan bixeyîde û careke din wan dinava kul û derdande bi tenê bihêle û her dem dihate bîra wê ku bi çi halî û hewalî û bi çi deha, nivêj, zekat û

bûka ku jê re veguhestîn nedît, rabû berê xwe da qoqê bin kulînê û guhê xwe li ser hêra lê tu deng û tu bêjin jê nekir, dayka Fatê dinava gelek fikar û gomanan de diçû û dihat lê nedizanî ka sedemê vê yekê çiye, ku kurê wê neçûye cem pevjîna xwe. Em vegerin ser pevjîna wî û keça mamê wî ya ku dema seharê zû ji xew şiyar bû û têgihişt ku zilamê wê di şeva ewlde ew ne ecibandiye û nehatiye cem wê, hema bi bayê bezê buxçika xwe girêda û biyek carî berê xwe dam ala bavê xwe û xeyîdî çû. Piştî ku roj avêt dayîka Fatê xwe nêzîkî qoqê li bin kulînê kir û xwest ku ji kurê xwe fêr bibe sedemê ku ew neçûye cem pevjîna xwe, lê çiqas kir û nekir gotinek tenê jî ji devê Qoqo derneket.

Kesî nezanî ka mesele çiye ka çime Qoqo qîma xwe bi keça mamê xwe neaniye. Qoqo heyanî çend rojan piştî wê şevê, nexwarin û nejî vexwarin bi devî wî neket û kesî êdî dengê wî jî nebihîst. Ji ber vê yekê dayîka wî gelek bi vê rewşê xemgîn û kovan dibû û çiqas li ber wî digeriya ku derd û kulên xwe ji wê re bibêje lê nekarî sedemê wê yekê jê fêrbibe . Qoqo êdî xeyîdîbû û li ser xwe dipûnijî bitena xwe dinava kul û xemên xwede kûr û dûr teriqîbû. Rojek ji rojan, piştî nîvê şevê dîse Qoqo dest bi axaftinê kir û gazî dayîka xwe kir.
Ji ber ku dayka Fatê tim bi rewşa şêrînê ber dilê xwe dihizirî lewma qet xew nedikete çavên wê û dema ku dengê wî bihîst, di despêkê de ji xwe re digot qey dengê wî dixew de li ber guhê wê çêbûye, lê biştî ku careke din dengê Qoqo hate guhê wê, biyek carî ji xwe vejniqî û bersiva wî da û jê re got: Pêje ez heyran, ez qurban dayik bigorî, bêje ka tuyê çi bêjê bêje eza li te guhdarim eve çend rojin te agir bi cerg û hinavê min xistiye, tenê tu bêje min derd, kul û merema te çiye, ezê rihê xwe bidim ji bo ku ez derid û birînên te derman bikim.
Qoqo dîse mebesta xwe ji dayîka xwere bilêvkir û vê carê ji dayka xwere got:Min ji were rastiya xwe vegot lê hûn weke xwe nêzîkî rastiya min bûn û ji we weye ku ez piçûkim û tiştekî tênagihêjim.



Zilamê talancî her sê şertê wî pejirandin. Zilamê siwar rabû çû jêre hespek, şûrek û henek pêdiviyên pêwîst jêre anîn û dane wî. Dirêde dema ku herdû bihevre dimeşîn jêre got_Guhê xwe başbide min emê neha biçin cihekî heft bira hene her heft birajî yek ji yekî xurtire, diqesreke heft qatde dijî, her qatek ji bo yekî û diher qatekî de xizînek zêr heye. Ev herheft mirov têrin û zilmê li xelkê dikin. Ji ber vê yekê ji dêla ku tu yê xizan talan dikê emê herin malê van talan bikin. Ma nebaştire!
Lê ji bo ku em bikaribin van, pêwîste di dema ku razayîbin em herin ser wan, ji ber ku dema ku şiyarbin weheya em herdû bitena xwe nikaribin wan. Seheta razana wan dinavbera duzdeh û yekandeye, lewma em dive wê demê herin ser wan. Dema ku herdû gihiştin ber qesrê yê siwar gote _Yê netizilam dekahere. Rabû yê netizilam rahişte hesinê xwe û heyanî jê hat li erdê xist, lê yê siwar destê xwe li milê wî da û jêre got: Neha tê wan ji xew şiyarkê, ji ber wê tu li vir bisekne û ezê biçim. Dema ku siwar gihişte qata yekê bê ku yê netizilam pê bihisê serîkî jêkirî kete berlingê wî û ejniqî. Yê siwar gihiştr qata duyan serîkî din hate xwarê, ya sisiyan serîkî dî hat û bi vî awayî seriyê serjêkirî li pey hev rêzkirin heyanî ku gihişte qata dawiyê. Zilamê siwar hemû xizîne valekirin û bi xwere anîn. Herdûyan zêr û diravên xwe li hespê xwe barkirin û ketin rê. Dema ku herdû birêde dimeşiyan, yê siwar ji yê netizilamre got: Lazime em sozekî dinava xwe de bidin ku kî ji me bimrê hemû tiştê heyî dighêjin yê din û pêwîste ku kî sax ji me mine, yê din wî veşêrê bê ku cilê wî jêkê.
Yê netizilam got_ Min ev şertjî qebûle. Dema ku gihiştin devereke xewlê, yê siwar ji yê netizilamre got: Ka vêderê bikole heyanî ku bighêjê qirika te. Dema ku yê netizilam dikola, ji xwere digot hebê nebê ev cihê tirba mine!
Mane me ji hevre sozdaye ku yê bimrê wê zêr mînin ji yê dinre, xwiyaye wê min bikujê û hemû zêran ji xwere bibê û ji xwere got: Madam ji bo mine ezê ji xwere xweş û rehet çêbikim. Dema ku yê netizilam karê kolanê temam kir, jê re

got: birastî bêje tu dibêjê ev cihê ku te kolayî cihê çiye. Yê netizilam jêre got: Birastî tibixwazê min ji xwere got ev cihê tirba mine, di wê anê de yê siwar dicihê xwede kete erdê û mir. Yê netizilam weke soza ku ji wîre dayî rabû ew bi tevû cilanve kire tirbêde, devê tirbê lê girt û hespê xwe û tiştê heyî bi xwere birin, riya xwe girt û çû. Dirêde dema ku dimeşî weswas kete dilê wî û ji xwere got: Çime vî ji minre got _ Pêwîste yê sax cilê hevalê xwe yê mirî jênekê, ma tu dibêjê cilê wî zêrin an zîvin, hebê nebê tiştek divê meselê de heye û tişta balkêş ewe ku wî dizanîbû ku ewê ewilî bimrê. Ji xwere got ez herim tirbê vekim; lê dîse ji xwere got: Nabe mane me ji hevre soz û ehid dabû. Meşa xwe dewamkir lê dîse şeytan kete dilê wî û vê care hêdî xwe negirt. Xwest dîse şûnde bizivirê lê dîse soza wî hate bîra wî. Bi vî awayî weke ewrê buharê weswas didilê wîde bicihbûbû û dinava didiliyêde diçû û dihat. Di dawiya dawiyêde, ji xwere got: Ma wê çiçêbê ez vê yekêjî didilê xwede nahêlim, rabû şûnde zivirî û derê tirbê vekir. Destek cil jêkir, lê meyzand vaye yekî dinheye ew jêkir dît vaye yekî din dibindeye heyanî ku gihişte destê cilê heftemîn, lê dema ku karkir destê cilê heftê jêbikê, ji nişkîve çavê xwe girtin û berê xwe jê zivirand. Ji xwere got: Mala min çûyî mîratê, min çi anî serê xwe ji ber ku hevalê wî derket jin. Dema ku yê netizilam bi çavê xwe dît, ji xwere got: Rastî ez netizilamim. Ku ez zilambame pêwîst bu cara despêkê dema diber minre derbas bû û silav li min neda, wê demê divê min hingî ew naskiribane û dema ku ji minre gotî: Nanê min dayî te min tu ji mirinê rizgarkirî û nanê min xwarî weke ku min di avêde berdayî û min ji nûke zanî gava ku min xwest ez pêre bimeşim, ji minre got: Bişertê ku navê te netizilambê û ji minre got: Pêwîste em bihevre weke birabin û heke ez zilambana minê ew soza ku dayî wî minê ew bicih anîba. Zilamê netizilam gelekî poşman bû, lê hêdî poşmanîjî tiperenakê. Rabû hêdîka cilê hevalê xwe dîye yek bi yek lêkirin û derê tirbê dîse girt û ji xwere sûnd û qesem da, ji îro û bêde dema ku ez zivirîm eşîra xwe navê min netizilambê, her sozê min dayîn xwe



re bixwazin. Dema ku deyîka Fatê bi herdû guhê xwe gotinên qoqo bihîstin bawer nekir ku ev gotin ji vî qoqî derdikeve; lê careke din qoqo daxwaza xwe jêre dubare kir û ji dayîka xwe xwest ku dema xwesteka wî bicih newe ewê bixeyîde û ji vî welatî barbike û nema êdî kes dixewnande jî wî dibîne . Birastî qoqo zarokekî newek zarokan bû û mirov ji vegotinên wî şaşomaşo dima.

Lê ji ber ku zilam û pevjîna xwe pir ji zarokan hes dikirin û heyanî yezdanê bextewer ev zarok ji wanre verêkir çiqas deha,nimêj,sedeqe û fitir li xizan û feqîran belavkirine û çiqas êş û azar di jiyana xwe de kişandine heyanî ku dehayê wan bi cih hatine û xwedê Qoqek kiriye nesîbê wan, lewma nedixwestin ku dilê wî bihêlin û bihêlin ku ji wan dûr bikevie û bixeyde. Çiqas ku Qoqo rastiya xwe ji wanre tanî ziman, lê bi serê wan nediket û bi awayekî seresere, sivik û bê ûmîd nêzîkî mebesta wî dibûn, lê ji milekî din ve jî ji bo ku kurê wan nexeyîde û ji destê wan neçe yan xwe nekuje xwestin daxwza wî bicih bînin. Ji ber vê yekê bi hilatina rojêre dayka Fatê kete dinava livûlebatê de ji bo ku jinekî ji kurê xwe qoqo re bugheze.

Rabûn ji keçên mamê wî ya herî mezin ya ku jiyanê têra xwe ji temenê wê xwariye û hîn nebûbû nesîbê tu kesî jê re veguhestin.

Dema ku bû êvar û dibin tariya şevêde, pevjîna wî jêre anîn û derbasî oda ku jiwanre amedekirine kirin û mane li hêviya Qoqo ku ew jî were û derbasî cem pevjîna xwe bibe.Piştî demdkî Qoqo ji nava qoq derket û xwest ku biçe û pevjîna xwe bibîne, lê dema ku derbasî odê bû û çavê wî bi pevjîna ku jêre veguhestine ket, lê çi dît û nedît, vaye dihindirê odeya ku jê re hazirkirine de jineke di emrê dayîka wîdeye li ser text xwe dirêşkiriye û li hêviya hatina wî sekiniye .Qoqo bi dîtina wî ji jinkêre aqil di serê wî de nema û biyek carî bê ku gotinek ji devê wî derbikeve, berê xwe ji odê zivirand û çû xwe kire dihindirê qokê xwe de û xwe bê deng kir. Bi derketina rojê re dayka Qoqo ji xew şiyar bû û xwest nasbike ka rewşa kurê wê çiye, lê kurê xwe li cem

Piştî ku herdûkan axaftinên xwe bidawîanîn, bihevre digotin:Ma qey qedera me eve ku em di vê dinyayê de êş û axînan bikşînin, tişta em dixwazin ji yezdanê mezin zêde ne girane tenê bile weke hemû xelk û alemê zarokekî bide me bile Qoqbe jî me pê qayîle.

Ji nşkîve piştî demekî dinava bêdengiyê de, carekî ji pişt perdê, li ser hendefa pencerê dengek derket û gazîdikir:
Dayê bavo.Lê ji ber ku deng melûlbû kesekî nebihîst û bersiva wî dengî neda.Careke din dengek ji pişt perdê derket, lê vê carê deng hate bihîstin, lewma hema zilam û pevjîna xwe li pişt xwe zivirîn û bihevre guhê xwe vehêran li ser cihê ku deng jê derketî û bibayê bezê berê xwe dane pencerê. Dema ku perdeya ser pencerê kaşkirin. Çibibînin û nebînin, dîtin wê qoqek li ser penceriye.Wê demê dema ku çavê wan bi qoqê li ser pencerê ket gelek kêfxweş û şad bûn ku yezdanê mezin dehayê wan qebûl kirine û hêviyên wan bicih anîne . Herdûyan bikêf û şadî rakirin kurê xwe û piştî demekî ku ew hembêzkirin û dane li ber ramûsanan ew anîn û kirin nava dergûşa ku ji zûve jêre amedekiribûn û her hêviya wan ewbû, ku ew roj were û carekî zarokek ji wanre çêbibe û wî têde bihejînin heyanî ku mirada wan bi cî hat û ew roj hat. Cihekî pir xweş jêreçêkirin û dergûşa wî hemû bi gul û leystokan xemilandin.

Wextekî şavê qoqê ku di dergûşa xwe de razayî dest bi axiftinê kir û gazî dayîka xwe kir:Dayê ez dixwazim ji were henk gotinan bilêvbikim dibe ku hûn şaş û matmayî jî bimînin lê ev rastiya mine û hûnjî dê û banvên minin. Di serî de pêwîste hûn bizanibin ku ez ciwanim lê dinava qoqekî de bicih bûme ji ber ku pîra sehar ez kirime di vî halî de ji ber vê yekê pêwîste ku hûn vê rastiyê ji kesekî re nebêjin û dema ku dema wê hat ezê ji hundirê vî qoqî derbikevim û vegerim weke xwe,lê neha û heyanî ku ez vegerim weke şûna xweya berê ez dixwazim hûn binavê Qoqo gazî min bikin û Ji bona vê yekê di diserî de ez ji we dixwazim ku hûn ji min re jinekî bixwazin. Lê geleke hûn keçeke lihevhatî û xwedî esil, fesil, weke heyveke çardeşevîbe û layîqê min be ji min



heyanî niha min bi cih neanîn; lê ezê vê carê vê sozê bi cih bînim. Dema ku yê netizilam zivirî eşîra xwe, hemû çûne pêşiya wî û xêrhatin lê kirin û navê wî hildan, lê wî ji wanre got: Ji neha û pêde banî min bikin netizilam. Dema ku eşîra wî ev gotin ji devê wî bihîstin hemû matmayî man; lê ji xwere gotin_ Dibe ku aciz bûbê an jê westiyaî bê ji ber vê yekê nekirin tiştek. Roja din yê netizilam rabû eşîra xwe hemû komkir, ji wanre hal û mesela xwe got û ji wanre xwest ku ji neha û pêde binavê netizilam banbikine wî

AQIL TACA ZÊRÎNE

Li welatekî mirovekî xizan û bêzar hebû.Çiqas vî mirovî dixwest ku zengîn bibe û ew jî weke hemû mirovên cîhanê dinava xêr û xweşiyê de bijî lê çiqas dikir û nedikir tiştek bi destê wî ve nedihat;nemaze yekcaran dema ku berê wî dikete bajêr û çavên wî bi qesir û qonaxê kesên maldar diketin,wê demê agir bi ser dil û cîgera wî de diket û weke çixareyekî hêdî hêdî ji nava xwe dixwar û dibû tirafe.Wê demê dilê wî ji jiyana wî sardibû û di dilê xwe de digot evjî jiyane û jiyana ez dêdejî dijîm jiyne.

Mirovê xizan li ser xwe gelek dipûnijî ji ber rewşa ku têde dijî û dikete nava xewin û xeyalên kûr û dûr.Di xewna xwe de didît ku bûye xwedî qesir û qonaxên weke wan li tu deverê dinyayê tunene û li ber derê qesra wî bi sedan xizmetkar û hişedar hazir û amedene li hêviya fermana wine sekinîne.Diçavgirtinekî xwilamê xwe hazir û amede li ber cavê xwe didîtine.

Di dinyayê de tişta ku dilê te bixwaze dihate li ber destê wî biyê ku tu ked û zehmetiyê diberde bide ji mal û milik bigre heyanî xwarin,vexwarin û likwekirin. Xwedê komek zarok didane wî,hemûjî bi jin û maldikirin.Li derdora qesra xwe ji her yekî ji wanre qesr û qonax avadikirin.

Hemû zarokên wî dibin ferman û daxwaza wîde diçûn û dihatin,ji ber wê ji hemûyan hezdikir û yek di ser yekîre nedigirtin.



## Qoqo

Li welatekî zilamek û jina xwe hebûn û demekî dirêj bû ku bi hevre pevjîn bûbûn lê yezdanê mezin tu zarok nekiribûn nesîbê wan.

Tu dever nemabûn û tu hekîm û loqman nemabûn ku xwe negehandibinê da ku careyekî ji derdê wan re bibîne û xwedê zarokekî bike nesîbê wan, ji bo ku pê kêf û şad bibin û jiyana xwe pê derbasbikin ji ber weke ku dibêji “zarok fêkiyê jiyanêne.”

Lê kirin û nekirin tştek bi destê wan ve nehat,ji ber wê xwe radestî qederê kirin.

Çiqas herdûyan pir ji hev hesdikirin jî lê jiyana wan bê zarok û eyal bê tam û dinava xem û kulan de derbasdibû. Ji ber weke hûn jî dizanin jiyana bê zarok, weke axeke bê verim, berheme û weke canê bê reh û xwîn.

Sal derbasdibûn, zilam û pevjîna xwe hergav û li ser her nimêjekî de deha, selewat dikşandin û hewara xwe digihandin yezdanê mezin û sedeqe li xizan û feqîran belavdikirin da ku merema wan bicih were û zarokek ji wanre çêbibe.

Heyanî ku dergehê miradan li pêşiya wan vebû. Rojek ji rojan zilam û pevjîna xwe li odê rûniştibûn û hêdî sebir û hedara wan ji bo rewşa ku têde dijîn nemabû.

Demekî dereng ji nîvê şevê bû û herdûyan xwe li ber hefre li ser nivînan dirêşkiribûn û ketibûn nava axaftinan, vegotinan hevdû dikşandin yek ji dayka Fatê û yek ji bavê Qoqo.

Agirê axîn û keseran dilê wan dida ber tîrên şewat weke şûna birînên xencerê yên ku of û şewat biser wan dikeve.

kiryarên nedirêde  li ser miletê xwe pêkbîne û li ser xwîna wî xwe jiyan bike.



Her dawiya xewneke wî sere xewneke nû bi xwe er dikşand û weke bablîsokê ji ber çavê remanê wî winda dibûn,lê gavê ku tîjikên tavê xwe ji ser ciyayan berdida ser bajar û gundan.Wê gavê mirovê xizan ji banê xewn û xeyalan dadkete li ser rastiya tûj û tal.

Ji nişkava mirovê xizan berê xwe da mala xwe bi kul û keserên weke şûna xenceran can û cergê wî daxdidan û dişewitandin.

Bi dirêjbûna wê şevê heyanî berdestê şefeqê xew nekete herdû çavên wî, tim dinava fikar,xewn û xeyalan de diçû û dihat;lê didawiya dawiyê de biryara xwe da, ku bikeve ser rê û xwe bighîne yezdanê dilovan, ji bo  ji derd û birînên xwe re dermanekî an çareyekî peydabike.

Mirovê xizan weke dînan lê hatibû carcaran bi xwere dipeyvî û digot:Ma qey hete hetayê ezê xizanbim bijîm li ser rûyê vê dinyayê û tim dinava kul û derdande temenê xwe derbasbikim û bivan kul û derdan bimrim û mirovê xwedî mal û milik wê tim dinava kêf û şahiyêde  bijî.Ev çi bazare!Ez tucaran vê yekê napejirînim û  qebûl nakim ji ber vê yekê ezê li çar hêlê dinyayê bigerim ta ku ez debarekî ji xwe re bibînim.Ger min dermanek ji derdê xwe re peyda nekir ez li vî welatî xopan û bêserûber venagerim.

Dema roj hilat rabû ser xwe henek nan û penîr diristkir, xiste nava tûrikê xwede û da milê xwe;berê xwe da felekê û pişta xwe da oxirê weke ku bi xeyalê xwe re bipeyve ezê herim û hemû xewin û xwestekên xwe û te bicihbînim,ger ez hatim emê bihevre dinava rastiyên xweş,bêhampa û azad bi hevre bijîn,ji ber vê yekê qet mereq û xema min nekşîne.  Ji ber ku rojekî were û ezê her li te vegerim.Bi vî awayî mirovê xizan xatir ji war û şûnwarên  xwe xwest û birêket.

Çend roj derbasbûn mirovê xizan dimeşiya bi şev û roj.Biber êvarî ve xwe gehande ser mêrgekî û biryara xwe da ku wê şevê li ser mêrgê biqedîne.

Rabû ji xwe re agirek hilkir û li dora agirê xwe palda.Di derengiya şevê de li se bêjna dengekî ji xew şiyar bû,lê dema ku çavê xwe ji hev vekirin û firikand.Lê heyanî kurtedemekî

tiştek li pêşya xwe nedidît.Ji ber wê yekê qwirên xwe dirêjî nava kûrahiya tariyê kirin,wê demê li ber çavên xwe dît ku livûlebata reşayiyekî li dora wî diçe û tê,bi dengekî bilind û bitirs gazîkir ew kiye.Gurê kor bersiva wî veda û got:Ezim netirse ez tu zererê û ziyanê nadime te.Mirovê xizan çiqasî bigomanbû ji soza ku gurê gor jêre dayî;lê dîsan jî xwest ku were civata wî rûne û meqseda wî fêrbibe.

Gurê kor ji ber ku dinya nedidît li ser tîna germahiya agirê hilkirî xwe nêzîkî agir kir û li deverekî nêzîkî agir li ser dûvê xwe rûnişt;lê ji ber ku mirovê xizan nizanîbû ku gurê boz biçavên xwe dinyayê nabîne,lewma gelekî jê ditirsiya û xwe jê dûrdigirt da ku xwe jê biparêze û guhê xwe vehêra li ser vegotina gurê kor.Gurê boz,xêre tu bitena serê xwe li van çol û çiyayayên bê kes û eman digerî, mirov dibêje qey te aqilê xwe windakiriye û tu biçolê ketî.Mal mîrat maqey tunabêjî dehbeyek yan marek tebixwe bê ku kesek bizanibe çi jitehatiye.

Piştî bêhnekî hizrandin û bêdengiy.Mirovê xizan destbi vegotina helûmeseleya xwe ji gurê kore kir û jêre ta biderzîvekir.Piştî ku gurê boz têgihişt ku derdê mirovê xizan çiye serê xwe hejand, axîn biser dilê wî ket û rondik ji çavên wî hatin xwar û ji mirovê xizan re got:

Qet tu dilê xwe bi xwe neşewitîne ji ber ku derdê min ji yê te gelekî girantire ji

Dema ku ez hatime li ser rûyê vê dinyayê û heyanî niha min tu xêr û xweşî ji vê dinyayê nedîtiye,ji ber ku çavên min dinyayê nabînin û weke tu jî dizane ev dinya nerojeke û nedurojin, ji bo ku ez îdare bikim û biqedînim.Ji ber vêyekê ez hewara xwe di despêkê de dighînim yezdanê dilovan û dighînim te dema ku te ji derdê xwe re çareyek dît; wê

gavê halû û mesela min jî jêre bibêje, berkî çareyekî ji çavên min re jî bibîne.

Bi vî awayê guftûguh di navbera gur û mirovê xizande bidawîbû;wê demê rojê têrîjên xwe vegirtibû ser çol û çiyayan.



Rastiya kurê şîr heram roj bi roj ji xelkên gund re kifişdibû û weke tava rojê xwe diyardikir.

Tişta ku kurê şîr heram dixwest bidestê xwe bixîne jêre lihevhat û diçû erî.Ji ber wê yekê rabû rojek ji rojan.

Ferman da hişedar û xuilamên xwe û ji wanre gote:Vê axê bikolin û van hestûmestûyên genî û riziyayî derbêxin û dûr bavêjin;ji ber ku xweşikbûna vî baxçeyî kirêtdikin û nerehetiyê ji bo mêva û ziyaretçiya çêdike.

Çend sal derbasbûn û hemû xelq û alem pê hesiyan ku kurê şîr heram ev kiryae kirêt û nedirêya mirovaniyê de kiriye;ji ber vê yekê rabûn biryara xwe kirin yek, da ku kes neçe nava baxçeyê wî û herkes xwe jêdûrbike û bi wîre nekeve peywendiyê heyanî ku hişê wî were serê wî û bi gunhê xwe bihise.

Çiqas ku kurê şîr heram maldarbû û tiştek jê kêm nedibû lê mayîna wî bitena xwe,dihişt ku her kêliyekî dinava agirê dojeha bêwefabûnêde beşewite bi êş û azaran ew diher çavgirtinekî de di gera mirinêde noqdikir û difetisand,li ber barana xezeba gotinên bavê xwe û mirovên li dredorê xwe;ji ber kiryara ku pêrabûyî û gunehê ku bi destên xwe yê gemar pêkanî. Her şev kurê şîr heram dinava kabûs û xewnên nexweş weke agirê dojehê diçû û dihat,xew tim lê diherimî û dibû hehir.Tim ji nav nivînên xwe direviya weke ku ji anva kumek koremarên kufekuf biser wan bikeve bireve.Bikûve diçû berê wî dikete mirinê mabû heyîrî bi kûve bireve.Cilên wî bûbûn agir û ew canê wî didane li ber tirên dojehî. Mirinê her gav xwe li xiyal û remanê wî dipêça û dengê bavê wî tim li ber guhê wî zingînî tanî û gazî wî dikir: Tucaran ez te efû nakim û heye ku tu tobe nekî û newê ser hişê xwe ne tu kurê minî û ne ez jî babê te me.

Ji wê rojê û şûn ve kurê şîr heram her roj berê xwe dida mizgevtan û tim deha û nimêj dikirin û xêr,sedeqe û qencî li feqîr û xizana dikir da ku yezdanê mêhrîban, bavê wî û miletê wî jê razîb û wî efûbikin.Bi vî ewayî xwe li beramberî xwdayê xwe,babê xwe,xelqûalemê rûsipî kir.Bi gunihê xwe hisiya û bû ebret ji bo her mirovekî ku bixwaze dirûtiyê û

demê tu û wijdanê xwe beramberî min hûnê bitena xwe bimînin.Lê wê demê ne ez te dibînim û dengê te dikim û ne tu careke din min bi çavan dibîne û dengê min dibhîze.

Vê carê kurê wî xwest ji bo dilsoziya xwe jê re bide nîşandayîn.Qet tu xem û mereqan nekşîne, ezê mezelê te li cihekî herî xweş û rehet çêbikim û kefenê te ji hevrîşmê û bi hemû rengên gulan bedena te bixemilînim û li hrî cihekî bilind li ber perê ezmanan te veşêrim.

Demekî dirêj derbasnebû, mirovê kal kete taya mirinê û piştî hevtiyekî ji nexweşiyeke pirgiran kete nava nivînan û çû ser dilovaniya xwe.

Wê demê kurê şîr heram hemû sozên ku dayîne bavê xwe li ber bayê payîzê berdan û rûyê wiyê nepenî yê rastî, hêdî hêdî dirjiya ser neynika resteqînên berbiçav.

Kurê şir heram didespêkêde û ji bo ku xelik û xizmên xwe bixapîne kete nave liv û tevgerê û xweda nîşandayîn ku gelek li ber mirina bavê xwe ketiye.Lewma piştî demekî êdî nedihate nav gundiyan û bitena serê xwe dimalêde dima.Çend roj diser vî halîde derbasbûn û kurê şîr heram dakete nava gund û xwest bi alîkariya gundiyan ziyaretekî li dora mazelê bavê xwe lêbike.Ji ber ku xelqê gund pê nizanîbûn ka mebesta wî çiye ji avakirina ziyaretê.Lewra hemûyan bi dilxweşî xwestin destekê bidine wî.Demekî dirêj nekişand û ziyareta ku kurê şîr heram xwestî avakir û hawîrdorê ziyaretê hemû bi gul û rîhanan xemiland.Ji ber ku cihê ziyaretê pir xweşbû û bi renkekî sipehî hatibû xemilandin,ji her deverî mirov dihatin ji bo serdan û qasidiya wê û gelek tiştûmişt bi xwere tanîn ji bo ku yezdanê mêhrîban hêvî û daxwazên wa qebûl bike û wan ji çavînî,qeza û belayan biparêze.

Çend sal derbas bûn û kurê şîr heram bû xwediyê qesir,qonak,milk û malên bi xêra ziyareta bavê xwe ya ku ji çûn û hatina mirovên ku sedeqe û diyarî tanîn vale nedibû.Kurê şîr heram ku bû xwedî qesir û qonax û birîka wî germbûbû, hêdî hêdî roj bi roj dihate guhartin û kesekî nekarîbû diber siya wîre derbasbibe.



Mirovê xizan karoûbarê xwe kir û berê xwe da deşta ku weke deryayakî li pêşiya çavên wî pehindibû,vedikişiya û çiqas mirov çqvên xwe lê dihêra nedikarî domayîka wê bibîne,bê serî û bê binîbû. Bisehetan dimeşiya bê ku navberekî bide rêveçûna xwe,tava rojê xwe digihande navsera ezmanan û bitîna xwe serê mirovan dişewitand;ji ber vê yekê bilez xwest xwe bighîne bin siya darekî ji dûr ve li ber çavê wî xuiya dikir.Gavek du gav sêgav ji lezbûna meşa xwe sivikdikir û gavê xwe hêdî hêdî dikirin şelît ji nişkîve xwe dît û nedît ku dibin siya darêde li ser axa hînik li bin siya darêde dirêşkiriye û dinava xwîdan û helke helkêde dilê xwe de noqdibe,ji tî û birça taqet di laşê wide nemabû.

Bayê deştê yê hînik û sivik,siya darê ya cemidî xewek şirîn diberda ser çavên wî.Bi rêwîtiya xewnan re dûr û kûr diçû,carekî xwe dît dinava dehl û deviyên têde tijî xox,hêjîr,hinar û çi zebzê ku dilê te bixwaze tê de peyda dibe.Çiqas zikê wî ji xwarina fêkiyan tijî dibû û têr dixwar lê dikir û nedikir çavê wî jê têrnedibû.Weke ku dibêjin: “Birçiyê zik têr dibe lê birçiyê çav tucar têrnabe”.Dixew de didît ku ji cem yezdan divegere û zengîn dibe,dibe xwedî malûmilk û careke din vedgere mala xwe,pevjîn dibe û bihemdê yezdan zarok ji wanre çêdibin û hemû daxwaziyê xwe bi cih tîne.

Ji nişkîve çavên xwe ji xew vekirin,çidît û nedît xewne an xeyale, zilamekî pîremêr,bejin kin û rî sipî li kêleka wî rûniştiye;biyekcarî da xwe û rabû rûnişt. Bismelah erehman erehîm û ji zilamê lê kêleka xwere rûniştî got:Tu cinsî an insî.

Zilamê pîremêr bi xwîn sarî û bêhneke fereh bersiva wî da û jêre got:Netirse ejî weke te mirovim ji adem û hewa çêbûme.

Ji rewşa yê xizan mirovê cotkar pê dizanîbû ku bê av û xwarine.

Ji ber vê yekê ji berî ku mirovê xizan jê pêxwarinê bixwaze heman henk av û nan ji nava xorçikê li milê û xwe derxist û dirêjî ber mirovê xizan kir û jêre got: Kerembike destê xwe

bavêjiyê, evjî para teye xwidê kir nesîbê te, ji ber xwiyaye tu neha gelek tî û birçiyî.Mirovê xizan ji berî ku destê xwe dirêjî xwarinê bike,pîremêrê cotkar jî dawetî xwarinê kir lê yê cotkar jê re got:Nişûcanbê ji tere min xwarin xwariye.Mirovê xizn dest bixwarina xwarinê kir û pêrepêrejî bi mirovê cotkare dipeyvî.Mirovê cotkar herî tişta zor ji rêwiyekî ewe ku bê xwarin û av bimîne.Ji ber ku ez gelek caran diriyande bê xwarin û vexwarin mame û min gelek zehmetî ji bo vê yekê kişandiye.Lewma ji min re bû wane ku ez tucaran bê hazirî ji malê dernakevim. lewma pêdivî heye ku berî mirov bikeve ser rê amedekariyê xwe pir baş bicihbîne da ku di rêwîtiya xwe de şepirze û perîşan nebe û tu jî dizane weke ku dibêjin “mirovê bê çek bi mirovekî miriye.”

Eîn weke wê yekê jî mirovê bê hazirî nikare dikarê xwe de biserbikeve.
Gotubêj dinavbera wande diçû û dihat û gotininan hevdû dikişandin.
Zilamê cotkar carekî
ji mirovê xizan pirsî. Derdê te çiye tu bi tena serê xwe li van çol û çolistanan digerê,ma qey tu nizanê ku ev dinya bê ewleye,bê serûbere û heçî çû jikîsê xwe diçe.Ji bervê yekê rêwîtiya bi tenê nebaşe
Weke pêşiyên me gotine” her teyrekî bi refê xwe re dimeşe”

Dema yê cotkar gotinên xwe bi dawî kirin.Mirovê xizan jêre dest bivekolandina derdê xwe kir û jêre hal û meseleya xwe vegot.Bi axînekî û piştî kêliyekî bêdeng pîremêrê cotkar dest bi axaftinê kir:Qet mereqa nekşîne û dilê xwe bixwe nwşewitîne divê cîhanêde kesekî bê derd û kul tuneye. Lewma pêwîste ku tu bihna xwe fereke,deha û nimeta ji yezdan bike,başe emjê newek heneka bê çav,ziman û guhin,wêdemê meyê çibikira.Peştî axînekî kûr mirovê cotkar yê kalemêr çixareyek ji mirovê xizanre pêça,jêre dirêjkir û jêre got:Keremke ji trer vê çixareya han vexwe û pê hinavê xwe hînikbike û qet xeman nekşîne her derdekî jêre



## KURÊ ŞÎR HERAM

Li welatekî mirovekî extiyar û pevjîna xwe hebûn.Lê çiqas demekî dirêj li ser pevjîniya wanre jî derbasbûbû,lê xwedê ti zarok nekiribûn nesîbê wan.Heyanî ku herdû pîrbûbûn û çerxa felekê têra xwe ji emrê wan xwaribû.
Lê li ser vê yekê jî tucaran hêviyê xwe qut nedikirin ku xwedê zarokan bide wan;heyanî ew roj hat,deha û hêviyên wan pêkhatin û yezdanê mehrîban kurek da wan lê dema ku pevjîna wî diwelidî çû ser dilovaniya xwe,lewma mirovê extiyar û kurê xwe bitena xwe mane rêwiyê jiyana zor û zehmet.

Şemendefera temenê jiyanê birêdiket û kurê wî hêdî hêdî simbêlên wî derdiketin û dibû zilam. Roj bi roj mirovê extiyar hîn bêtir qedir û qîmetê kurê xwe yê bitenê digirt û her tiştê ku dixwest jêre pêk tanî.

Rojek ji rojan,pavê pîremêr xwest ku nasbike ka kurê wî heyanî çi astê jiwî hesdike,ji ber vê yekî jêre got:Ger ez bimrim tûyê min çawe û li ku derê veşêre.Kurê wî bi zimanekî hilû û xweş bersiva wî da:Qet tu behsa mirinê neke.Ma qey tidixwaze ez bimirim;ji ber ku ez mirina te tucaran ranakim û ez bi hêvîme ku xwedê emrekî dirêj bide te û emrê minjî têxe ser emrê tede.

Bavê kal gotina wî birî û jêre got:Nêzîk yan dûr her rojekê wê were û ezê ji vê dinyayê koçî dinyaya din bikim.Wê

biparêze.Padî şah pişta xwe bi gelê xwe germdikir,lewma didespêkêde ji tu tiştî neditirsiya.Lê belê dema ferman da ji bo ku miletê wî xwe hazir û amedebike ji bo şer û cengê,wê demê fermana xwe dît weke ku eveke sar û cemidî di ser serê wîde were xwar ji nişkîve xwe dît û nedît ku ji ser textê xewn û xeyalan dikeve ser axa rastiyên tal û djiwar yê ku guhê wî dibhîze lê aqil û mejiyê wî narake.Padîşah xwest careke din fermana xwe dubare ji miletê xwe re ragihîne.Lê vê carê bersiva mletê wî jêre evbû:Em ji bo şer û mirinê nehazirin,pêwîstiya me bitiştekî tuneye.Ma em dînbûne xwe bidin kuştin ji bo netiştekî.
Herin ji padîşah re bibêjin kes ji bo şer hazir nîne ger ew mêrbe û dixwaze şerbike bile bitena sere xwe here şer bike.

Padîşah birojan dinava hizir û fikarande diçû û dihat û ji nûve her gotin û şîretên bavê wî jêre digotin xwe yek bi yek li qiraxê mejiyê wî didan.Lê piştî çi,dem derbasdibû û feyda poşmanî û gotinan nemabû.Didawiya dawiyêde pevjîna wî jêre got:Nehêjaye hewqa tu mitala û mereqan dikşîne,mane mal û milkê me pire em dikarin bi malê xwe herî artêşa xuirt ji bo paristina mal,milik û welatê xwe pê biparêze.

Padîşah li ser pêşniyariya pevjîna xwe artêşeke herî xuirt kirî ji bo paristina mal û milkên xwe.
Çend sal di ser vî halîde derbasbûn û carek ji caran, artêşa ku hatî ji bo paristina qesirûqonaxên padîşah roj bi roj çavên xwe berdidane malûmilkên hatina ji bo paristina wan û xwestin destên xwe deynin ser hemû xêrûbêrên heyî.

Bidemêre kifişbû ku ew xebera hatî belavkirin ku dijminên padîşah wê êrîşbikin ser malûmilkên wan galegalekî pûç û valebû.
Lê piştî çi! dem derbasbûbû û wê demê artêşa ku hatibû ji bo paristina padîşah her tişt talan kiribûn û fatihejî li ser rihê padîşah hatibû xwendin

Û her tişt dinava agirê xezeba tematiyêde dibû xwelî û tiraf



dermanek heye.Pîremêrê cotkar ji yê xiznre got:Te ji minre derdê xwe got aneha dor hatiye ku ez ji tere derid û kulê xwe bibêjim.Tu vî erdî dibîne yê ku heya çavê te dibîne pehin û dirêj dibe û miron nizane kîjan sere wiye û kîjan dawiya wiye,ev hemû erdê ha yê mine lê dîsanê ez jî weke te xizan û jarim.
Piştî ku mirovê xizan li derdê yê cotkar guhdarkir,

ji rewşa erdê wî matmayî ma û jê pirsî sedema vê yekê gelo çiye;ma qeytu zarokên te tunene ku arîkariya te bikin ji bo cotkirin û çandina vî erdî,yê cotkar lê zivirand û jêre got:Mesele ne ewe xuidê ji te razîbê birek kur û keçên min hene alhemdulilah ez ne limineta tukesîme;lê pirsgirêk ji vê mestire û zortirê.Her sal ez û zarokên xwe vî hemû erdê ku tu bi çavên xwe dibîne, cot dikin û diçênin û zibil dikin û av didin bi hêviya ku em jê sûd wergirin lê ji berî ku genim avis bibe hemû bi yekcarî zer dibe û diweşe erdê.Çiqas ku tu hekîm û loqman naman ku min mesela erdê xwe ji wanre venegot û gelek ji wan bi xwe jî hatin û li rewşa wî meyzandin;lê bê feyde min tu çare ji rewşa erdê xwe re nedît û min weke qederekî ji xwere pejirand heyanî vê rojê.

Ji ber vê yekê ez hewara xwe diserîde dighînim yezdanê dilovan û peyre dighînim te,dema ku te ji derdê xwere çare û dermanek dît;tu ji yezdanê dilovan re halomeseleya min jî jêre bibêjî,berkî ji derdê min re jî dermanekî bibîne.

Mirovê xizan piştî ku gohdarî derdê mirovê cotkar jî kir û têgihişt ku ne ew tenê li ser rûyê vê dinyayê xwedî kul û derde.
Xatir jê xwest û berê xwe da felekê û pişta xwe da oxirê.

Gelek roj û şev derbasbûn û mirovê xizan her carê dinava deştê de li gundekî dibe mêvan û çîroka xwe ji hemû kesîre tîne ziman û her carekî xuirçika xwe tijî nan û pêxwarin dike ji ber ku weke wê cara derbasbûyê bê av û xwarin nemîne. Ji ber ku deşt ferehûdirêjdibû û meşa dideştêde mirvan gelekî diwestîne û li hemû deverî av û gund peydanabin.

Bi ketina tariyê re mirovê xizan xwe gehenda gundekî li pesara çiyê hatibû avakirin,gund nezêde mezinbû ji ber

wêyekê,berê xwe da mala despêkê û carekî du caran li derî xist.Xwediyê male go ew kiye li derî dixe.Mirovê xizan bersiv da û got: mêvanin,mêvan ma hûn mêvanan nahewînin,xwediyê malê bersiva wî da û got: Keremke mêvan mêvanê xuidêne;liser sera û ser çavan hatî derbasbibe mêvanê hêja mal malateye.

Piştî ku mirovê xizan destûra derbasbûna hundirê malê sitand derbasî hindirbû. Xwediyê malê xêrhatina mêvanê xwe kir û ji ber ku şîva wan amedebû hem ew vexwande ser xwarinê, ji ber ku hemû xelqê gund miro û xizmên hevdûbûn, ji ber wê yekê dema ku mêvanê malekî dihatin;wê şevê civata hemûyan li wê malê digeriya heyanê derengiya şevê.

Civet digeriya û heryekî ji kesên ku dicivatê de rûniştîbû serpêhatî û derdên xwe ji koma heziranre vedigotin.Dem digha nîvê şevê û dor digihişte mirovê xizan û wî jî weke hemû haziran dest bi vegotina derd û kulê xwe ji cemaheta hazire kir.

Dema ku yê xizan çîroka xwe û çîroka gurê kor û mirovê cotkar ji haziranre bidawîkir;hemû kesên hazir bi baldarî lê gohdarîdikirin û
Ji ber kul û derdê mirovê xizan hemû xelqê gund matmayî diman, lê dema ku derd û kulên xwe tanîne bêriya xwe û tanîne beramberî hev hemû wek hev jandidan.

Bi derketina rojêre ji ber ku hemû xelkê gund vexwandiyê dawetêne, wê hemû berû bajêr birêbikevin. Li ser vê yekê gundiyan dixwest ku mirovê xizan jî bi wanre were dawetê.Lê dema ji mirovê xizan re xwesteka xwe bilêvkirin. Yê xizan bersivekî neyînî ji wanre da û ji wanre got:Ez kesekî li bajêr nasnakim û ez mirovekî rêwîme û riya min dûre ji ber vê min bibexşînin;lê li ser daxwaziya hemû xelqê gund û li pey hev, mirovê xizan xwesteka gundiyan pejirand.

Ji ber ku ev cara yekem bû ku mirovê xizan bajarekî hewqa mezin dibîne lewma ku derbasî nava bajêr bûn û li koçe û kolanê bajêr digeriyan, hertiştê dibajêr de ji mirovê



dîsanê xwe ji bîradikir hertişt pişt guhê xwe dikir û tim dixwest wek xwe bihizire û bijî û nêzîkî jiyanêbibe.

Çend sal derbasbûn û rojekî ji rojan padîşah çû ser dilovaniya xwe.Wêdemê kurê padîşah beramberî dijwariya pêlên jiyanê bitena xwe dima û ji ber ku xwe ji bo rojekî wiha qet hazir û amede nekiribû dikete nava gelek xewn û xeyalan û ji bitriyan xwe windadikir.Yek ji gotinên bavê wî qet di bîriya wî de nemabû û heme bi yekcar dema ku hîn heftiyek di ser mirina bavê wîre hê derbasnebûbû ferman da ku hemû malûmilkên xwe yê heyî li ser gel belav bike û ji herkesekîre digot:Hêdî bêwîstiya me bikar û xebatê nîne.Her tiştê ku dilê we bixwaze bixuin û vexuin û lixwekin male me zehf û têra me dike heya ku em saxin.

Çend sal di ser vî halî de derbasbûn herkesî tişta ku nedîtî dît û tişta ku nexwarî xwar û vexwar û bi şev û roj kêf û şahiya xwe dikir. Piştî derbasbûna demekî bê xîretî û tiralî dinava gelê wîde belavbû. Herkesî ji ber ku tişta ku pêdiviyê wî pê diqede li ber destê xwe hazir û amide dibîne,hêdî destên xwe netêxistin ava germ û neya sar.Miletê bajêr gihiştin wê astê ku ji bêxîretî û xemsarî û bitrbûyînê xîrenakin ku ji ciyê xwe bilivin û rabin ser xwe li derdorê xwe bigerin û binêrin.

Padîşah ji vê kiryara xwe gelek kêfxweşdibû û dihizirî ku miletê wî ji ber vî tiştê ku pê rabûye wê pêve girêdayîbe û çi wexta ku ferman da wê dibin fermana wî de tim hazir û amedebin.Ji ber vê yekê ti goman û didilî nedikete aqil û dilê wî û jiyana xwe birengekî rehet û bê xem didomand,biyê ku tiştê nepenî yên li bêşiya xwe bibîne.

Rojek ji rojan saloxek belabû ku dijminên derdorî wan pê hesiyane ku gelek mal û milkên wan heye û ji ber vê yekê dilê wan tematiya xêrûbêrên heyî dike.Lewra xw amide dikin ji bo êrîşî ser wan bikin û hemû xêrûbêrên heyî têxin destê xwe.

Saloxa ku hatî bihîstin li her deverî belavdibû û dihişt ku padîşah bilezûbez bikeve nava liv û tevgerê de ji bo ku malûmelkê xwe, qesirûqonqxên xwe û miletê xwe

sipîbûye. Ji ber vê yekê pêdivîheye tu her kiryarekî ku ez bê radibim bi rengekî seresere û sivik lê nenihêre û baş têde bihizire,berî ku tu nêrînê xwe û biryarê xwe diderheqê wande bistîne,da ku tu tucaran nekevê dinava şaşîtî û xeletiyande.Dema ku ez diemrê tedebûm ezjî gelek caran weke te nêzîkî vê jiyanê dibûm lê min tiştek ji wan nêzîkbûnê xwe qezenc nedikir û herdem ez rûbrûyê binkeftinan dihatim heyanî ez bûme xwediyê van têgihiştinên kûr û dûr.Ji ber vê yekê pêdivî heye ku tu li gotinê min baş û bi baldarî lê guhdarî bikî û weke ku tu jî dizane emrê min mezin bûye û dema ku ez mirim wê demê tuyê bibê padîşahê vî welatî,xwediyê van hemû qesir,qonax û hem malûmilkê heyî.Ji ber vê yekê geleke tu bizanibê wê wêdemê gotina dezpêkê û yadawiyê wê gotina tebe.Lê ew gotin û biryarê ku tu bistînî wê qedera miletê te hemû biwanve biryarên ku tu bidî ve girêdayîbe.Ji bo vê yekê lazima tu li min baş guhdarî bikî da ku tu gelek caran ji mirinê û windabûnê rizgarbiî û bighêjî wê hêza ku te ji hemû tengasî û aloziyan derbasbikî û hertim bibê hêza çareseriya pirsgirêkan. ji ber vê yekê ku tu nexwediyê bîrewerî û aqilekî têgihiştîbe tuyê nikaribê nûnertiya vî miletî bikî.

Dibe ku ez neha saxim û li ba teme ji ber vê yekê tu tenê kêfa xwe dikî û nizanî ev malûmilikê heyî ji kûve û bi çi ewayî min komî serhevkiriye û heya min xwe gehandiye vê astê min çqas ji emrê xwe diberde xerckiriye. Mesele ne ewe ku ez bi gotinan bînim zimzn ku ez çiqas ji vî miletî hesdikim an hesnakim ;lê ya gîrin ewe ka ez çiqase li pêşeroja vî miletî dihizirim.Gelek tu bizanibî ku amaca min ewe ku ez dixwazim tim ev milet bi ked û xwîdana xwe bijî .Ji ber weke ku dibêjin “tişta bêked were sitandin merov li ber nade”.Mesele ewe tişta ku ez bê difikirim û dihizirm û dibînim di pêşerojê de tu pê nafikirê û hesabê wê nakî. Lewma tu her tim rehet û bê kul,derd û xem dijî

Gotinên padîşah xwe diserê kurê wî de nedigirtin di guhekîre diçûn û diyêdîre derbasdibûn. Ew gav û ew kêlîbû,



xizanre balkêşdihat û bibaldarî lê temaşedikir.Bi çav û hestên sosret û şaşomaşo li derdora xwe tim dimeyzand.

Her car li çep û rastê xwe dinhêrî lê;dema ji nişkî ve li pêşya xwe meyzand biyek carî aqil ji serê wî reviya. Çidît û çinedît,girseyeke gel li pêşiya wî diherike tu dibêje qey çemeke û berê xwe daye deryayekî.

Hemû miletê bajêr û bajarokên derdorê bajêr li vê qadê kombûne ji ber kû îro daweta kurê birayê başaye û herkes divê tê de hazir û emedebe.Govend digeriya û dengê dahol û zornê bi ser bajêr diket û xwe li bedena
çiyan dixist û deng vedida.

Herkes ketibû dinava karûbarê amedekariya dawetêde.

Ji ber vêyekê henekan dest bi hûrkirina goşt dikirin û henek kesên dinjî şerab û fêkî digerandin,tişta ku dilê te bixweste ji xwarin û vexwarinê li wir peydadibû ji ber vê yekê îro eyda feqîr û xizanane û bi xêra vê rojê wê zikê xwe tijî xwarin û vexwarin bikin û wê deha bikin ku hemû rojên wa bi vî awayî bidomînin lê;heyf û mixabin ev xwesteka wan dimîne xewn û xeyalên her tim li ber bayê dicin bê ku biencambibin.Di wêdemêde dîse kul û birînên wî yê kulbûyî derdibûn,êş û azar jê diherikî.

Coşa dehwetiyê dawetê bi hatina qiralre hînbêtir bilintirdibû û dema ku qiral gihîşte qada dawetê herkesî bejna xwe beramberî hizûra wî ditewand û xêrhatin lê dikirin,silav lêdikiri û silava wî divedan.

Piştî demek derbasbû û dawet hîn digeriya carekî çavê padîşa kete ser mirovê xizan û ji ber ku cilûbergên wî neweke yê xelqê wêdeverêbû; ji ber vê yekê gelek bala padîşa dikşand û dicîde padîşah ferman da hişedarên xwe ku wî mirovê xizan bînin cem wî;derhalde fermana padîşah pêkhat û mirovê xizan li pêşiya padîşah hazir û emedebû.

Mirovê xizan dema gihijte hizûra qiral biyekcarê bejna xwe tewand û bêdeng li hêviya vegotina qiral rawestiya.

Ji ber ku ev cara yekem bû ku mirovê xizan di hizûra padîşahekî hazirdibe lewma dilê wî ji tirsa dikir ku dicihê xwe de raweste.Mirovê xizan dinava goman û şikande diçû û

dihat.Bixwere dipeyîvî û digot:Gelo evê çi ji min bike,ma qey wê min bikuje an wê min têxe zindanê an û an...

Ji nişkîve û li ser dengê qiral mirovê xizan ji nava xewin,xeyal û gomanan dakete ser rûyê rastiyên berbiçav.Padîşah ji mirovê xizan pirsî û jêre got:Tu çikesî û ji kîdeverê hatî û li çi digerî dinava vî bajarîde;lê dema yê xizan bi axînekî kûr û recifî bersiva wî da û jêre got:Padîşahê min mesela min dûrûdirêje,wê gavê padîşah têdigihişt ku derd û kulên wî bir giranin,ji ber vêyekê ew vexwande cem xwe ji bo ku hal û mesela wî fêrbibe.

Li se biryara padîşah çiqas mirovê xizan bi gomanjî bû lê ma qey diwêriya ku li pêşberî padîşah fermana wî bi cî neyne.

Ji ber wê yekê mirovê xizan ji aliyekî ve kêfxweşdibû û digot berkî padîşah arîkariya wî bike û ji aliyekî din ve jî daxwaza padîşah gelek hizrandin di mejiyê wîde çêdikir û gomanên bi tirs jêre yek ji yekî xirabtir çêdikirin û komî ser hevdûdikirin.

Weke keştiyekî ku li ber pêlê deryayan çepûrastê xwe windakiribe û nizanibe pêl wê bikûve direvînin, dikete di nava mitalên bê binî û bê serî de;weke kevirê ku dikeve binê bîreke bê binî de û hêdî hêdî dengê wî kevirî nayê bihîstin.Bi van xeyalên hingavtî û teriqî yên ku bi asoyên xwe didrûtin û bi dilê xwe diçirandin.Hêdî hêdî dawiya dawetê dihat û

hemû gelê bajêr qefle bi qefle belav dibûn û qada dawetê vale dima weke keriyê bezê xwe êvariya ji çolê berê xwe dide nava gund.Kom bikom girseya gel ji qadq dawetê veiqetiya.Di dawiyê de pedîşah û hemû hişedarên xwe jî ji qada dawetê veqetiyan û berê xwe da qesr û qonaxên xwe.

Hemû xweşikbûna bajêr li milekî û qesir û qonaxên padîşah li milekî din dima;bi xweşikbûn û bilindahiya xwe weke çiyayekî xuiyadikir bi baxçeyê xwe yê ku li hawîrdorê qesrê dirêjdibû û hemû rexê wê dorpêç dike û dixemiland, ji hemû çeşîtên gul û fîkiyan hatibû xemilandin.



# AQILÊ SIVIK BARÊ GIRANE

Hbû tunebû li welatekî padîşahekî pir zengîn û maldar,lê çiqas ev padîşah xwedî mal û milk bû jî dîsanê tim dixwest ku miletê wî her tim dinava kar û xebatêde be. Ji bo ku tucaran dev ji xwe bernede û bikeda destê xwe û xwîdana xwe bijî û tama jiyanê bizanibe.

Rojekê ji rojan kurê padîşah, yê ku qet tinebûn û xizanî nedîtiya û dema çavê xwe li dinyayê vekiriy dîtiye û nedîtiye ku her tişt dinava lepên xwede hazir û amide, biyê ku tu ked û zehmetiyekî ji bo peydakirina pêdiviyên jiyanê bibîne;ji bavê xwe re digot: Mane evqas mal û milkên me heye û hetanî hetayê têra me û miletê me dike.Çiqas em jê bixwin û vewin jî tucaran xilasnabe.Ji ber çi em van diravan li ser gel belav nakin,ji bo ku miletê me ji me memnûnbe û her tim dinava xêr û xweşiyê de bijî,mane weke ku dibêjin “emir xilasdibe lê şuxil xilasnabe.”Ma qey nebese, ma heya kengî ev xelkê xizan û belengaz wê di vî halîde bimînin,Mala vî miletî çû mîratê dinava vî karê ku heroj canê mirovan binaxdike.Ma qey wê dawî li vê jiyana bi êş newê.

Dema ku padîşah li gotinên kurê xwe guhdarî dikir, matmayî ma û piştî demekî bêdeng û hizdandinin kûr û dûr bersiva kurê xwe da û jê re got:Kurê minê hêja û delal,pêwîste tu bizanibe,ku ez wek te lêhatime û nûke weke xwe lêhatime û ev pora serê min nejixwede

rêveçûna xwe,bê ku bixwarin û vexwarinê bihizire, heya ku xwe gihande cem gurê kor û jêre çîroka çûwîna xwe û zivirandina xwe hemû li pey hev jêre rêzkir û daxwaziyên jê hatine kirin jî hemû yek bi yek jê re raxistin û didawiya dawiyê de ji bo çavê wî jî tişta ku yezdan dilovan jêre vegotî bilêvkir.Gorê kor piştî ku li halûmeseleya mirovê xizan gohdarî kir, ji xwe re got bi xuidê û qesem tu mirov li ser rûyê vê dinyayê ji vî mirovî bê aqiltir û dîntir nînin.
Weke ku dibêjin "xwdê goşt dide mirovê bê dinan."
Ma mirov nedînbe wê hewqa şens û siûd ji nava destê xwe birevîne û pey xeyalên vale bikeve û weke ku dibêjin "çûkek didestê tede çêtire ji dehê ser darê."
Lê ez çi bêjim û çi nebêjim wî bi destê xwe qerera xwe xiste nava lepên min û dihindirê xwe de got:Bi xwedêkim kesek ji vî mirovî li ser rûyê erdê dîntir û bê aqiltir nîne.

Ji ber vê yekê ji mirovê xizan re got bibexşîne emrê min mezin bûye û guhê min giran bûye ji ber vê yekê, min dengê te nebihîst ji kerema te re henekî xwe nêzîkî min bike da ku ez baş dengê te sehbikim,lê dema ku mirovê xizan xwe nêzîkî gurê boz kir, kurê kor xwe avête ser serûçavên wî û ew dinava gola xwînêde fetisand û xwîna wî liçavên xwe xist.



Her tiştê girêdayê qesrê û dorbedorê wê aqil ji serê mirovan direvand bi hesin û cemala xwe.Mirovê xizan nizanîbû li kuderê binê re û li kuderê nenihê re, ji ber ku aqilê wî bawer nedikir tişta ku çavên wî dibîne;ji ber vê yekê nedizanî ku dinava xewn û xeyalan de dijî an dinava rastiyên berbiçavde dijî.

Padîşah jê xwest ku derbasî oda wî bibe,çiqas mirovê xizan nedixwest derbasî oda padîşah bibe ji şerim û fediyan lê; neçar dima ku biryara padîşah bipejirîne;ji ber vê yekê û li ser daxwaza padîşah hilkişiya qata jor û derbasî odeya wî bû.

Ji dilnimziya padîşah,comerdî û camêrtiya wî,mirovê xizan her diçû cesaret û wêrekiya wî li beramberî qiral hîn zêdetir dibû û hêdî hêdî xwîn bi rehetî li her deverê laşê wî bi hesanî ji nû ve digeriya.

Piştî ku herdûyan şîva xwe xwarin,padîşah ferman da wezîrê xwe ku kes derbasî cem wan nebe.

Bi gotina padîşah fermo mêvanê ezîz.Ka çîroka xwe ji min re vebêje,ez neha ji hemû deman bêtir li te gohdarim.Mirovê xizan rista çîroka xwe bi kolûderdên xwe despêkir û derbasî kolûderdên gurê kor bû û peyre xwe gehan de mesela yê cotkar û pê re yek bi yek xwe gehande heyanî ku
çavên padîşah pêketî û ew vexwandî hizûra û meqama xwe.

Mirovê xizan bi hêviya alîkariyekî ji padîşah bigre, ta bi derzîve kir.Her carekî ku mirovê xizan vekolandina kulûbirînên xwe dikirin padîşah sere xwe li ber van hemû kul û derdan her tim dihejand û of û axîn dikşandin.
Dema ku mirovê xizan vegotina çîroka xwe bidawîkir padîşah bi dilekî şad jê re got qet xeman nekşîne;ji ber ku, kul û xemên min ji yê te deh qat zêdetirin.Tu dibînî evqa bajarê mezin,gund,qesir û qonaqxên li derdora vî bajarî bi hemû dehil û zeviyên xwe û erdê çandiniyê tev milik û malê minin û weke te bi çavên xwe dîtî ku miletê min pir ji min hesdike;lê çiqas ez dikim û nakim hokmê min naşide û zor nabe.Karê min bisernakeve û xurtbûna min diyarnabe. Ji ber

vê yekê ev hemû milk û malê ku tu dinavde ku yê kîjan mirovî bana wê tucaran xemgînî, êş û xende cihê xwe nedîtibane ku derbasî dilê wî bibin.Lê Heyf û mixabin her tim bihezarê kul û derd dilê min dorpêçdikin,digvêşin û qet min rehet bernadin ku ezjî weke hemû mirovan di nava xêr û xweşiyê de bijîm, ji ber vê yekê dema ku yezdanê ezîz û dilovan ji derdê te re dermanek peydakir;jê re hal û meseleya min jî bibêje,berkî debarekî an çareseriyekî ji derdê min re jî bibîne.

Piştî ku mirovê xizan li derdê padîşah jî gohdarî kir û barê derd û kulên wî hîn zêdetir û girantir bûn bi derketina rojê xatir ji padîşah xwest,berê xwe da felekê û pişta xwe da oxorê.

Mirovê xizan gelek deşt,newal,gund,bajar,çol û çolistan derbaskirin û qet hêviya xwe ji gihiştina amaca xwe tu caran qut nekir.Berê xwe da rojê û birêket.Di dawiya dawiyê de mirovê xizan gihişte ber destê yezdanê mihrîban û mebesta hatina xwe jê re diyarkir û yek bi yek derdê gurê kor, mirovê cotyar û padîşahê ku dixwaze hukmê wî bizor bibe li ber destê wî raxist.

Piştî ku yezdanê aqilmend li mebesta hatina mirovê xizan gohdar kir.Di despêkê de ji bo derdê wî jê re got dema ku tu bigehêjî kuderê tuyê li wê deverê

bibe maldar û tişta ku dilê te dixwaze wê ji tere pêkwer. Lê ji bo meseleya gurê kor jê re bibêji bile mirovekî bê aqil bikuje û xwîna wî li çavên xwe bixe wê çavên wî ronî bibe û wê dinyayê bibîne û ji bo derdê mirovê cotkar got:Ew erdê ku hose zerdibe û berhemê wê hemû diweşe; di bin wê axê de hemû xizînin zêr û mîratên dîrokîn hene;ji ber vê yekê bile wê axê bikole û wan hemû zêran derbêxê wê gavê wê erdê wî jî berhem bide û ewjî bibe xwedî malûmilik.

Di dawiyê de ji bo meseleya padîşahê ku dike û nake lê hukmê wî zor nabe.Ew padîşah jine ne zilame lê kes bi vê yekê nizane ji ber vê yekê bêwîste ku bi zilamekî re pevjîn



bike ji bo ku hokmê wê hîn xurtir bibe û bikaribê her tiştî têxe bin bandora xwe.

Piştî ku mirovê xizan ji derdê xwe û hemû derdên ku emanetî wî hatine kirin derman û çare ji wan re dîtin;xatirê xwe ji yezdanê bextewer xwest û bi kêf û şahî berê xwe da felekê û pişta xwe da oxorê.

Mirovê xizan ji kêf û şahiya nizanîbû çibike û çineke ji kêfa aqil û hişê xwe winda kiribû didespêkêde xwe gehan de cem padîşah,wê demê padîşah didîwanêde rûnştîbû û civet li derdorê wî digeriya,lewma mirovê xizan ma libenda wan heya ku hemû civata li dredora qiral rûniştî belavbû.Wê gavê ew û padîşah bitena xwe man. Padîşah li ser agir li hêviya hetina mirovê xizanbû lewra xwest têbighîje ka ji bo derdê wî yezdan çi derman jêre verêkiriye;lê dema mirovê xizan vegotinaYezdanê dilovan jê re raxist qiral gelekî şad û kêfxweşbû û ji mirovê xizan re got:Ji ber destek û alîkariya te ez hazir û amedeme ku bitere pevjîn bikim û ez bawerim emê her tim dinava xêr û xweşiyêde bijîn lê mirovê xizan ji ber ku ji keyîf û şadiya xwe windakiribû daxwaziya padîşah vê carê nepejirand û jêre got: Ezê herim welatê xwe û ezê li wir weke yezdan gotî bibim padîşah û qiral.

Mirovê xizan bi vî ewayê xatir ji padîşah xwest û berê xwe da warê mirovê cotkar rojek duroj ajotin xwe gihan de mala yê cotkar

Mirovê cotkar bi kêfxweşiyekî mezin xwe gehande pêşiya mirovê xizan berî ku ew bigihe hewşa male, bi dilekî gerim pêşwaziya wî kir û jê re tişta ku yezdan gotî jê re yek bi yek bilêvkir, mirovê cotkar bi vê yekê bir şadbû û li mirovê xizan zivirî û jê re got ji ber ku te derdê me dermankiriye û pirsgirêka me çareserkir bile nîvê van zêrê û mîratên di nava erdê min de jiterebê.Lê mirovê xizan daxwaza yê cotkar nepejirand û jê re got:Weke ku yezdan bextewer gotiye, ezê li welatê xwe bibim padîşah ji ber vê yekê pêwîstiyê min bi mal û milkê tu kesî nîne.

Piştî ku mirovê xizan xatir ji mirovê cotkar xwest.Çend roja bi şev û roj meşiya û ji keyfa qet navber nedida